

Adress : YKDK, Nordensflychtvagen 20, 112 51 Stockholm, Tel: 08/52 87 56 Adresa tëkili u naman : P.O. BOX 240 12-750 24 Uppsala/SWEDEN Postgiro: 50 37 99 - 9/ ISSN 0348-7385

Gel ji hukumeta Ozal re got "na!"

Encama Hilbijartinên Tirkiyê:

Ji %68 ê dengdaran ji hukumeta Ozal re gotin "na!". Ger hilbijartinên tevayî bûna, hukumeta ANAP' ê diket

*** Tevî zilm û zora dîktatoriyê, tevî piştgi-
riya Amerîka û monopolên giregir, tevî riş-
wet û hîla jî partiya Ozal bi zorekê ji %32'ê
dengan girt. Li gor sala 1983'ya dengên par-
tiya Turgut Ozal ji %12'a zêdetir kêm bû.**

* Demirel : " Hilbijartin di bin tehdîda dew-
letê de çêbû. Lê hinan şîrmaq (sîl) xwarin
hinan jî şîrmaq avêtin: Di hilbijartinan de mile-
tê şîrmaqek avêt hukumetê".

Āmahîk r.7



Gel di dora dengdanê de

Dêrsim
cardin di bin
singuya de

Di meha îlonê de şeş salên dîktatoriya faşîst qediya û ket sala hefta. Di van şeş salên borî de cûntayê li welat gelek xwîn rijand û gelek hovîtî kir. Li kîjan gund û bajarî bîna şoreşgerekî, welat-parêzekî girtin adetî ewder ji nuh ve îşxalkirin, bi heftan, bi mehan li wan deran terorek hov û har dan meşandin. Ji van bajarana yek jî Dêrsim e. Cûntayê, ji 12'ê Îlonê û virda ye her rika xwe li Dêrsimê girêdaye. Her carê manakê dibîne, bi leşker û polîsa digre ser gelê Dêrsimê, wan bi qîç û pîlan di bin çoyan re derbasdike û dû re jî li gor kêfa dilê xwe hinekan digre û hinekan jî dukuje.

Ji van qetliaman yekê jî di 1'ê Tebaxê, leşkerekî giran girt ser gundê Topuzlu yê navça Uvaciqê.

Dūmahik 1.6

Parlamento ne riya xelasiyê ye

Bêgûman, çi di riya radyo, televîzyon û rojnameyan de be, çi jî di riya xebera Armanî de be, haya xwendevanên me ji encama (nefîce) hilbijartinê Tirkiyê heye.

Bi taybetî xwendevanên Kurdistanê Tirkiyê jî zanin her çiqas ev hîlbijartin ne li teveyiya Tirkiyê, bes li çend bajarên çêdibûn jî, bi çavekî wuha lê hat nihêrtin her wekî ku hîlbijartin li teveyiya Tirkiyê bin. Encama hîlbijartinan jî wî ruyê han ê wê eşkere kir.

Gelo, encama hilbijartinê çi nîşanî me didin?

Yek jê ew bû, her çiqas gelek partiyên burjuwazî têde beşdar bûn jî carek din hat xuyakirin ku çî . qanûn û nîzama hîlbijartinê, çî jî awayê pêkhatina we , ji mis-qalekî demokrasiyê jî bêpar bû . Bes ew partiyên ku li ser nasyonalîzma Tirk, li ser mafên burjuwaziyê Tirk hatinbûn avakirin beşdarbûn. Ji xwe jî bilf van tu partiyên pêşverû û çep û komunîst ên Tirk, beşderiya wan li alîkî, lê nikarin bi eşekereyî kar û xebata xwe jî bimeşînin. Partiyên Kurd jî xwe ne hewce ye ku em behsa beşdarbûn û nebûna wan bikin. Herkes jî dizane ku çî çep çî rast tu partiyeke Kurdî, ne kare bi eşkereyî xebat bike ne jî beşdarî hîlbijartinan bibe. Tirkiye dewletek wîloye ku peyva “Kurd” bi tenê jî jî qeyd û deftera hatiye verotin.

Di van hilbijartinan de serbestiya propagandan ji bo wan partiye burjuwazi bi xwe ji bi qanûna esasî ya faşîst û wan qanûnên ji fermanên generalan pêkhatî, hatibûn hidutkirin. Rê tune bû ku kes karibe ruyê reş ê dîktatoriyê li ber xelkê derxe meydanê. Radyo û televizyona dewletê bi tevayî ji bo propaganda dîktatoriyê û ya partiya ser hukum hatibû amadekirin. Di dewra propagandên hilbijartinan de dîktatoriyê di rîya ordî û polîs de terora xwe ya nav xelkê berfireh kir, xwesi bide xuyakirin ku hê li ser serê wan e, hevsar ji destê xwe bernedaye. Di rex demagogiyên şovenîstî li Kurdistanê êrîşa xwe gurtir kir, destê xwe dirêjî Kurdistanê Iraqê jî kir, da karibe bala millet ji karê xwe yê qirêjê bide alî, çavê wan bitirsîne. Partiya ser hukum, ji bo karibe reyên xelkê ber bi xwe de bixîne perê dewletê kir bertil (rişwet), bi milyaran pere rijand. Bi kurtî, hilbijartin di rewşek wuha de derbas bû, ku Demirel bi xwe jî xwe

Dūmahik 1.6

Dîktatoriya Evren û Ozal hat protestokirin

Li Ewrûpayê li dijî cûnta faşîst tevgerên
bi girseyê pêkhatin.

STOCKHOLM

Li Stockholmê roja 12'ê Îlona 6 saliya dîktatoriya Evren û ozal ji alî hêzên pêşverû yên Kurd û Tirk ve hat protesto kirin. Federeyona komelên Kurdistan, komel û rêxistinên piştgirê Yekîtiya Çep (Komkar-Swêd, YKDK, ÎSTÎB, DÎBAF, Gerçek Adk., Birlik Yolu), KKDK, Dayanişma Dernegi, Komîta Piştigirîya Riya Şoreş û Îşçi Gerçeği bi hev re heftakê seranser li hin herêmên Stock-

Roja 12 ê Îlonê jî, van hêzên jorîn meşek protestoyê çekirin. Meşê bi sloganên li dijî cûntayê jî meydana Sergelstorgê heta ber konslosxana Tirkîyê dom kir. Di belavok, slogan û axaftinên meşê de li gel mahkûmkirina cûntayê, êrîşa Ordiya Tirk a ser Kurdistanê Iraqê jî bi xurtî hat rûreşkirin û piştgiri bi gelê Kurd re hat nîşan dan. Di meşê de abûqat û parlementerê Partiya Sosyal Demokrat Hans



Bîstikek ji meşa Duisburgê (Foto: Armanc)
holmê stand vekirin, pûl li dîwa
ra xistin û belavok belavkirin.

Goran Franck jî axaftinek kir û li

Dûmahîk r. 7

Li Kurdistanê Iraqê Serkeftinên Nuh

Pêşmergeyên qehreman serkeftinên xwe
hîn domdikin û xisaretên dijwar dighênin
rejima xwînxwar.



Di dawiya meha borî de, piştî şerekî dijwar bi leşkerên rejîma Iraqê re, pêşmergeyên Yekitiya Nîştîmanî Kurdistan (lagirê) Karîze xist destê xwe û xisareteke mezin gihande rejîmê. Bi vê yekê re çav-soriya û êrişa rejîmê jî gurtir bû. Û dîsa êrişên xwe yên hovîtî bir ser navçeyê û nemale jî ser gundên Sergelo, Yaxsemer, Helden, Malome, Çoxmax, Çalewe, Gabilon... û hinin din. Lê pêşmergeên mîrxas rê li ber leşkerî û caşên dijmin girtin û meydana şer kirin

hêtûneke agir li serê êrîşkaran. Di van şeran de pêşmergan dest danî ser hemû zebayên (qereqol) lêşkerî yên hêla Mawet. Her wiha êrîşa dijmin rawistandin (sekinandin) û xisarêteke mezin gihandin wan. Ji 500 lêşkerî bêtir hatin kuştin û birîndar kirin. 60 lêşker û noker hatin girtin. 2 balefir hatin xistin, yek Soxoy 7 û ya din jî tîpê PÎLATOS a Swîsî bû. Çend makîne û topên lêşkerî hatin xerakirin û şewitandin. Gelek çek û mune

Dûmahîk r.7

Li Farqînê 100 zarok mirin!

* Li Entabê di van 9 mehên dawî de 100 zarok,
li Farqînê di nav 3 mehên dawî de 100 zarok ji
ber nexweşiya zikêş û navçûnê(îshalê) mirin.

* Karbîdestên dewleta kolonyalîst qet tu tedbîran nêstînin. Ji 6 nexweşa bes 1, îmkân dibîne ku li nexweşxanê rakeve. Rûpel : 6

Rûpel : 6

Li Ser Edebiyata Zarokan

-2-

Bi saya van rastiye gelemperî em li tiştên ku me xwendîye mîze-kin. Me çî xwend? **Ya rasttir em him li berhemên ku kokên wan ji welatê rojava ne him li yê ku hevkarên wan li Tirkîyê ne û him ji li yê ku mejîyên wan wekî mejîyê burjuwazî ye carê mîze-kin.**

Ji ber ku me wana xwend û em bi wan mezin bûn. Ji ber vî yekê jî ez di wê bawerîyê de me ku dema em bi lêhûrbûna gelemperî dest pêbikin wê mewzû bêtir ronî bibe, bê fam kirin.

Mesela, li hemû welatên wekî Tirkîyê niv kolonî hetanî bi kolanên gundan jî ketina Tomîks, Teksasan ka em carê bala xwe bidine wan:

Ji alî CIA yê ve xwedîkirina van weşanan, ji alî cîhazên por-pogandayên emperyalîzmê ve îdarekirina wan, em hemû pê dizanin. Lêbelê em cardin jî nikarin zarokên xwe ji vî feqa wan xelas bikin, biparêzin. Em nikarin biparêzin çimkî yê ku van pirtûkan hazir dîkin, dinivîsîn bi rastî jî zarokan nasdîkin, yanî ne kesên wisa basît û nezan in. Xeyal û rastiya ku hertim li gel hev bi zarokan re heye bi hawakî gelek hostayî dikarin bigihînin hev, ew li dijîbûn û jî neheskirina xerabîyê ya ku bi zarokan re heye, bi hêsanî bikartînin. Dikarin bi karbînî lî bi kîjan alî de? Ji xwe mesele jî di vir de ye.

Di van pirtûkan de çî heye? Berî her tiştî qehremanekî ku milê wî nayê badan heye. Ya din jî, ew însan, ya jî însanên pîs (xerab) ku ew bi wan re mucadelê dike heye. Qehreman, jî şerîf re her du jî (qehreman-şerîf) bi hev re jî malek wan jî malên dewlemend re xizmet dîkin, milk û malên wan diparêzin... Di her pirtûkê de ev wisa ye û di her pirtûkê de zarok jî vî qehremanê xwîn-şîrîn, xweşik ku piştî wî tu carî nayê erdê re çapikan lê dixin. Lê di seranserê pirtûkê de esas tiştê ku zarok jî bo wî çepikan lêdixe ev e: Qehremaniya ferdî, xizmeta jî polis re û muqedesiya mulkiyetê ye...

Yan jî em li Tirkîyê li pirtûkên Tugcu ku reqorê fîrotanê şikandî ne binêrin. Çî heye di pirtûkên Tugcu de? Di van de jî ferdîtî car din fikra (tema) bingeîn e... Zarok her tim

tenê ye, feqîr e, serî wî di belayê de ye. Di dawiyê de, zarok, bi alîkariya dewlemendekê xêrxwaz meselên xwe heldike. Ox, erê welle, li dinyayê çî însanên baş hene! Ma çî dibû, yekî jî me jî hez bikira! Ji bona ku em xwe bi wan bidin hezkirin gelo em çewa bikin?..

Hûn dixwazin, êdî em li pirtûkên ku di nav pirtûkên klasîkên zarokan yê dinyayê de çiyê xwe saxlem kirine wek Cinderella, Pol-yanna, Keçika Şewqe Sor û h.w.d. binêrin...

Fikra hemûyan kêma yan zêde yek e: Ferdîtî... Zarok her tim bi xebatên ferdî li pê saadetê ye. Yan jî zarok li gel hemû nebaşîyan, bextewar dibe. Û bi vî hawî êdî ew, nebaşîyên li dora xwe bi musamaha dikare qebûl bike. Yan jî zarok jî sebebên nebaşî yê bingeîn tî dîrxistin, demarî dibin sebebên taliya jiyanê...

Ger em bi kurtî bibêjin, di pirtûkên zarokan yê ku armanca wan jî burjuwazî re xizmetê dike, em van xusûsiyetan dibînin:

Ferdîtî: Ferdîtî, mewzûa van pirtûkên bi vî babetî ne ku divê jê gazin neyê kirin. Ji ber ku wek tî zanîn ferdîtî esasê dîtina dinya kapitalîst e. Ji daxwaza ronakbîrên burjuwa ku zarokan bi vî ruhî mezin bikin tebtîr tişt tune.

Zarok hertim li pê li berxwedana ferdî ye. Bi hewakî wisa ku, dixwazin mefhumên grûp, komik û civatê jî zîhnê zarok jî bin de paqîbikin, dewsa viya ferdî digre.

Rê li ber wendakirina dijayetîyan.

Dîrok bi dijayetîyan heye û hemûyên dijayetîyan jî her tim bi bingeîn sosyal in. Lêbelê nivîskarê burjuwa, jî ber sebebê ku vatîniya wî ye, divê çavkaniya rastîn veşêre. **Ger wisa neke, yanî dema ku çavkaniya dijayetîyan nîşan bide wê tîkeve rewşa însanê ku dara bin xwe dibire.**

Nivîskarê ku di vî zanayîyê (şûûrî) de ye wê çî bike? Di her rewşê de divê sebebek, çavkaniyek jî bo zarok bî dîtin. Ji ber ku valayîyê heye û ev valayî bi çî hawayî dibe bila bibe divê bî dagirtin. Tam di vî merhelê de "însanê xerab" derdikeve sahnê. Însanê xerab... Ev însanê xerab li gor rewşê demariyêke, ya haydûteke,

ya cîngeneke (aşîq, qereç), ya yekî Îndîyanî (qizîlderîlî), ya bîkareke, ya feqîrêk e û h.w.

Bi Qederê Bawerî Anîn: Mîrov li hember qederê nikare tiştêkî bike. Û her çî hîkmet be jî ev qedera tu carî bi ruyê gel re nakene. Lêbelê divê meriv li ber vî yekê nekeve, jî ber ku dilê Xwedê jî kê re bixweze dide wî û divê ev jî neyê jî bîr kirin? Xwedê çî gotîye dibe, dawî vala ye.

Muqedesbûna Mulkiyetê: Qet malê te tune be jî li malê însanên din ne fikire. Yê din malê wan çîqas heye, jî ku hatiye... Eviya te qet û qet alaquadar nake. Û him jî pîrr xirab e tiştên wisa fikîrîn. Ji ber ku mafê mulkiyetê mafekî pîroz e. Bi çavêkî xerab li wî mîze-kin him bîdînî ye, him jî bîmanî. Û jî xwe tu nabînî, ew însanên ku tu pîrr jî wan hez dikî jî tîkoşîna parastina vî mafi didin. Wek însanekî baş ma tu jî naxwazî di vî tîkoşînê de çiyê xwe bigrî?...

Ji Qanûn û Nîzaman re Hurmet: Bêguman ev qanûn û nîzaman jî alî karbidestên civata ku tu tî de dijî hatiye danîn. Vana, qedexê kirînen ew kesên ku aletên hîlberînê di destên wan de ye, yanî van qedexeyan yê ew kesên in ku li civatê hukim dîkin û bi zorê bi civatê dane qebûl kirin. Bi vî alî jî ew, li dijî rastiye, başîyê, bi kurtayî li dijî hemû tiştên pêş de û pêşverû ne... Lê nivîskarê burjuwa zendên xwe vedimale û zarokan jî van qanûnan re hurmetê dike. Çî xweş e, ne wisa?

Heyraniya Burjuwa: Dewlemend însanên baş in, însanên ku jî çêyîyê hez dîkin. Ji van însanên baş hez kirin, jî wan re hurmet nîşan dan, jî alî wan ve îdare bûyin çî tiştêkî baş e! Him evana ew kesên ku jî wan hez dîkin zû ya dereng îhya dîkin.

Bi kurtayî di van pirtûkên zarokan de hemû temayên (mewzû) ku tî bikaranîn jî sistema mewcûd re xizmet dike, kedxuriyê meşrû dike, pêrgiyê li hemû pêşweçûnan digre... Vana hemûyan jî armançên yek in. Ji bona ku em mewzûyê dirêj nekin emê tenê çend mîsalên ku tî bîra me rêzbîkin: "Edalet esasê milk e", Her pînc tîliyên meriv ne yek in", "Li hem-

Ebubekir PAMUKÇU

ber qederê nayê rabûn", "Xwedê jî kê re bixwaze dide wî", "Dewlemend kerê xwe di ser çîyan re derbas dike, lêbelê feqîr di riya rast de wenda dibe", "Wa hatiye, dê wa here", "Deriyê ku tu li ber dixwî û vedixwî pê re xîyanetê neke", "Tişt bi zorê nabe", "Edetên nuh nakeve gundê kevn" û h.w.

Baş e, li gel vana hemûyan çî wezîfe dikeve ser milê me? Ya hîn rast tiştê ku em bikin, jî zarokên xwe re, jî heval û hogirên xwe re pêşniyarên ku em karibin bikin ma gelo divê di pirtûkên zarokan de kîjan xusûsiyet hebin? Bi gotinek hîn eşkere, gelo kîjan tema divê nebin mesajên pirtûkên me?

Pirtûkên me berî her tiştî divê karibin viya bibêjin: "Belê, her pînc tîliyên me ne yek in. Lê her yek li gor xwe, li gor qabiliyeta xwe îş dike û jî eynî rehê yê, li gor hewcedariya xwe fêde dibîne". "Wisa hatiye lê dê wisa neçe". "Bê guman edetên nuh dikare tîkeve gundê kevn". "Edalet ne esasê milk e, esasê civatê ye". "Eger ku dewlemend dikare kerê xwe di ser çiyê re derbas bike, kerê ku dewlemend lê suwar bûye, kerê kê ye". Erê bi pera saadet na be lêbelê bî pere jî saadet na be" û h.w.

Vana dikare hîn jî zêdetir bibin...

Niqta hereketê ya ronakbîrên realist rewşa sosyo-ekonomîk ya welatê ku mîrov lê dijî û daxwaza birîna vî rewşê ya hedefê ye. Bi vî aliyê xwe jî edebiyata zarokan û rewşa sosyo-ekonomîk, fikra politîk di nav hev de û di nav tesîrek diyalektîk de ne. Lêbelê pirtûkek zarokan qet tu wextê ne broşura propaganda e dîtinek siyasî ye jî. Bi vî dîtinê re jî divê bi şidet mucadele bî kirin. Dema siloganên (şîrên) siyasî ket pirtûkên zarokan sin'et tavilê dimre. Divê neyê jî bîr kirin ku, sin'et jî bona însanên di her salî de (biçûk û mezin) hewcedariyek e. Zarokekî ku bî sin'et hatibe mezinkirin, jî aliyê pîr baş û humanîst (îsanî) bîpar mezin dibe. Bêguman ev, netîcyêke ku meriv qet naxwaze. Divê em jî bîr nekin, wezîfa sin'etkar (huner-mend) jîyandin a sin'et e, ne kuştina wî.

(Dôm dike)

Stiriyên me

Bavê Nazê

KURD BÊ WAN JÎ DIBE

Xweş tî bîra min, di xortaniya xwe de gelek caran li ser kesên navdar ên ku bi nijadê xwe Kurd bûn em diketin qirika . Pîrê caran jî me xwe bi wan mezin dikir û digot: "Ma ne Selaheddîn Kurd e û jî me ye. Û Ehmed Şewqî, emîrê şairên Ereban, ew jî Kurd e.

Dema mîletên din xwe bi hozanên xwe mezin dîkin, tiştêkî durust e û divê navê wan li sikak û bajaran kin, tim-salên wan garsînen bajaran bînan danîn. Lewra destê wan di geşbûn û pêşveçûna civaka cîhanê û mîlet de heye.

Lê hozan û zanyarên bes bi nav Kurd ne xercê vî tekrîmê ne. Çimkî ew neçîrvan bûn jî bo mîletên ku nuha Kurdan bindest dîkin. Van kesan ne tenê ev rol dilîstin, lê mîletê Kurd dikirin gorî jî bo wan û laşê Kurdan dikirin pîr, da ku ew mîletên nuha (cîran) di ser re herin.

Di virde pîrsek tî kirin: Gelo ne ew in ku bûne sedemek jî sedemên bingeîn heya îro Kurd negihîştine mafên xwe yê rast û rewşa? Eger em bi "erê" bersîvê bidin, vîga ma durust e em xwe bi wan mezin bikin û serê xwe bi wan bilind bikin?

Dema berê, dema ku hîn mîlet nezan bû, dibû ku wuha bûna. Lê nuha, ne seyr (ecêb) û şerm e ev bawerî di nav me de berdewam bibe? Hozan û zanyarên ku bes bi nav Kurd in, di heyamê xwe de xwe jî mîletê me şuştin û Kurd jî xwere kirin kîncên berşoyê. Ma çî koranî bi çavên me hatiye, em nuha wan jî xwe re dîkin kîncên cejn û dîlanan?

Weko em dibînin, roja îro ne hewce ye, lêkolînen lîgi ser navdaran, da ku bidin nasîn ku ew bi eslê xwe Kurd in. Ne hewceye jî em serê xwe bîşînin û bêjin: "Ji çî hatiye navê Picasso". Ne girîng e ku ev nav jî peyva bîkes an jî jî peyvên din hatibe. Lê ya girîng ew e ku pîrs bî kirin: Gelo çî jî Kurda re kirine Selaheddîn, Şewqî Rosafî, Yaşar Kamal? Heger em jî heqîyê nêrevî, divê em li mîlet-perwariya navdarên bi nav Kurd binêrin, ne li navê wan. Mesele nav tenê be, wê Kurd bî wan jî karibe çiyê xwe di nav mîletan de bigre.

MALA APO

Li Şamê, gava ez diketim sikaka mala Apo(*), çar-çav min li dora xwe dînerî, da ku ez nasbikim kes jî emnên Sûrî qelawîzyê dike, yan na... (Lewra mala Apo demek dirêj di bin qelawîziya emnê Sûriya de bû.) Piştî re min difîskiland û çivik dida xwe û bi lez bez derbasî hundirê Apo di bûm.

Bidîna hatina xwe ez derdiketim û dema texnekî durî mala Apo diketim. Bi serfirazî û şahnazî diçûm malê, çimkî paşla min mişt dibû bi serpêhatîyên gotînen Kurdî ên cara yekem min bihîstibûn jî Apo.

Li Stokholmê, dema ez berê xwe didim "mala Apo"(**), serê min dikeve bin lingên min jî şerma û fedya. Çimkî jî min werê, ku hemû kesên li wir bi qerezûzî li min temaşe dîkin û di orta hev dibêjin: "Binêr parsekeki din jî hat". Daku nekevim bin tîrêjen awirên wan, ez xwe davêjim hundirê "Apo" mîna çukê, ku jî ber başokê bireve.

Bi derketina xwe dişa hawîrdor dînerim, gava kesî nabînim diçim bi alî postê de. Lê her û her ez mijûl dibim, çawa çeka sosyalê bikim pere, bî ku kes wê di destê min de bibîne.

(*) Apo, leqeba mamoste Osman Sebrî ye.

(**) Kurdên li Swêdê jî sosyalê re -ciyê ku alîkariya xwe werdigirin- dibêjin mala Apo.

di vînderdîm. Kurdê ki Stockholm di ê jî arîbeyay pêser. Wîja di enbzan qîsey kerdî, sloganî eşte.

Wîja ra ma û Kurdê ki Stockholm dir ê piya hendê hewtsey merdimî, meydanê Stockholmî ra kewtîm ray verê xo da konsoloxaneyê Tirkan. Ma şî konsoloxaneyê Tirkan ver. Wîja di enbzan qîsey kerdî, ma sloganî vatî ma dewleta Tirkî ew başqanê înan lanet kerd. Wîja ra verê xo da konsoloxaneyê Iraqî konsoloxaneyê Tirkan vera enbazê mayê Uppsala bol edzyay bî, ê wijara abirayay.

Konsoloxaneyê Iraqî ver di zî enbazan qîsey kerdî, vîja di ma hem Tirkîya hem jî Iraq lanet kerd û pîro bî vila. Ê enbazê jî Uppsala ra kewtî ray, hendê neway-se kilometran ray amey. Wa dinya bizano ki ma nêmerenê, ma teslîm nêbenê hendê kî ma ra jew (yew) merdim estêso fina veng do bivijîyo. Ma nimirenê, Tirk, Ecem, Erebbew bo fina nişeno ma vînî kero. Ma do înan ra kalîk û pîrîka xo bigîrê, ma do ney înan rê nêverde.

Ez veydano Kurmancan, Dimilîyan ew Soranîyan werzê xo ser! Ma jew

bî, dişmenan ra heyfê xo bigîrê, înan hetî gûniya xo nêverde! Werzê jew bî doşîya bîdê pê lej bikerê.

DESTKA NIVÎSKARÊN ARMANC RE

Rojnama Armanç hejmara dawî me girt. Bi tevayî bi Kurdî weşandîna rojnamê pêwîsteke. Bi sedhezaran Kurdên li derveyê welat diviyahiya (ihtiyaca) rojname yê bi zimanê xwe dîkin. Bona baştir bikaranîna zimanê Kurdî her divê bi Kurdî bî nivîsandin.

Zîmanek çîqas xwedî binyatek dirêj û dewlemend be jî, di nivîsandinê de ku xwe nepeyitandibe ew zîman, wê qels û jar bîmîne. Xasma di roja îro de pirtûkxana Kurdî heja pîrr qelse.

Di warê rastnivîsandinê dedevjenk (munaqêşe) di nava nivîskaran de heye. Bona terîşandina dev-

1.6

Namên Xwendevanan

GAM BI GAM UPPSALA RA HETA STOCKHOLM

Ma miyandê Upsala ra heta Stockholm qandê protestoyê bonbardûmanê Kurdistanê Iraqî payana şîmê:

Tirkan 15'ê de na meng di çend teney teyareyê bombardûmanîya şî Iraqî ser. Iraq di çend teney dewê Kurdan bombardûman kerdî. Nezdîyê hîrê sey Kurd kîşt. Ma na zordareya û barbareyda Tirkan protesto kerd. Lanet bo î namusizan rê.

Ma roja Êne sahat new di meydanê Uppsala di arêbiyaymê pêser. Sahat new ra hata sahat jondes û nîm (yewendes û nîm) camêrdê Kurdan, ciniyê Kurdan, qeç û külê Kurdan ê ki xebera ci est bî ê pîro amey. Ma wîja ra sahat jondes û nîm (yewendes û nîm) di kevîtim ray. Heta teberdê Uppsala sloganê xo eşte. Heta teberdê Uppsala qeç û külû Kurdan ma di amey ma kerdî ray ew ma ra abirriyay. Teberdê Uppsala di di kilometrey siya-

yis ra tepeya ma vînderdî. Pêinê nameyê xonuştî (yazîkerdî). Ma pîro şeştî û jew kesî bî, nînan ra pancas û hîrîyê ci camirdî, heştê ci zî cinî bî. Ma hendê çîhar panj kilometrey şî tepeya varan (yaxer) vara, varanî (yaxerî) bin di hendê di kilometran şîme. Eya tepya varan vînderd. Hendê vîst û di kilometrey şîme tepeya, hendê des deqîqan vînderdîm, tewrandê madi çîçî estîbî ma werd. Wîjara fina kewtîm ray, ma amey nezdîdê "Merşta", enbazanê mayê Stockholmî marê şamî ardê. Ma hendê nîm sahatê şamiya xo werdê. Şamiya me riz, tîrşê balcanan ew selate bî. Ma amey "Merşta" miyan bî şan, enbazan refleksî kerdî vila ma i kerdî kolandê xoya ki erebeyê ki ray di yenê ê ma bîvine.

Ma rayo sloganê xo eşti govenda xo anti, dêrê xo vatî. Texmîndê mi ra hendê çewrêş, kilometran di hendê vîst

û panj daqîqan ma çay şîmitî. Fina kewtîm ray. Texmîn ra hendê pancas kilometran biyên ma amey bî, fina enbazan ma rê şamî ardê, ma ronîştîm. Ma hendê nîm sahatê şamiya xo werdî fina varan varayê. Werîştîm kevîtim ray şewî zî bol serdî bî wexto ki ma ronîştî ma germî bî, veto ki ma werîştî ma bibî honikî, zey cemedî. Ê honikî sera bol enbazî ma teqet ra kewtî. Çîhar teney ciniyê Kurda hendê pancas kilometran amey tepeya edizay ew ma ra abirayay. Hendê şeştî kilometran biyê ma amey bî, di teney cinî ew newdes enbazê ma zî edzyay, ma ra abirayay. Varan zî bol varayên. Ma hendê şeştî û panj kilometran bî amey bî, enbazan fina ma rê çay ardê, ma çaya xo pirdî bindî şîmitî. Ma hem çaya xo şîmitê hem zî govendi xo anti. Wîja ra fina kewtîm ray, varan zey enbazê mayê ray o terkê ma nêkeno. Texmîn



NÛÇEYÊN DERVE

Konferansa Stockholmê Bi Serfirazî Xelas Bû

Konferansa Stockholmê, bû serfiraziya aştiwaz û tekoşerên çekdaxistinê. Konferansa Stockholmê bi girêdana peymanekê xelas bû. Li gor peymanê, di dema tetbîqatên leşkerî de hêzên dewletên beşdar bûyî (35 dewlet beşdar bûbûn) ger ji 13.000 leşker an jî ji 300 tankî zêdebin, berî destpêkirina tetbîqatê divê hevûdu agahdar bikin.

Eger hejmara leşkerên ku di tetbîqatê de beşdar dibin ji 17.000 zêdebe divê çavdêr ji welatên din bîn dawet kirin. Ji bo çavdêran hin şert û qaîde hatin danîn.

Çi di tetbîqatên derxistina leşkeran ji deryayê ber bi reşayîyê de û çî di tetbîqatên paraştûvanan de, eger hejmara leşkeran 3.000 be, divê berî tetbîqatê, welatên din bîn agahdar kirin. Eger hejmar 5.000 be divê çavdêr bîn dawet kirin.

35 dewletên ku di konferansê de



Bistikeke ji civînê

beşdar bûn, divê her sal di 15'yê Cotmehê de salnama tetbîqatên xwe û hejmara leşkerên ku di van tatbîkatan de beşdar bibin, pêşkêşî hevûdu bikin.

Divê her dewlet, tevgerên leşkerî yên bi 40.000 leşkeran an yên ku ji vî hejmarê zêdebin, divê wek listekê, di nav du salan de pêşkêşî hevûdu bikin.

Eger dewletek ji rapora dewletek din şik bike û bawerî bi bicîna peymanê neyne, dikare daxwaza rêkirina çavdêran bike. Dewleta ku ev tişt jê hat daxwazkirin, divê di nav 24 seetan de bersiv bide û çavdêr jî divê di nav 48 seetan de li ciyê tetbîqatê bin. Çavdêr dikarin bi otomobil an jî bi teyarê biçin ciyê tetbîqatê.

ÇI HATE GOTIN?

Kesên ku bi siyasetê bilî dibin û diplomatên cihanî, bi dilxweşî û pesindarî li ser civînê axaftin:

Miterand : "Netica Konferansa Stockholmê gava pêşîn a serkevîtinê ye û wisa xûya ye ku wê bawerî li hember şikê bi ser keve".

TASS : "Hemû nûnerên ku di konferansê de beşdar bûbûn realîte û mesûliyetek mezin nîşandan. Konferansa Stockholmê rîya Konferansa Ewlekarî û Hevkarî li Ewropa vekir. Ev konferans di Cotmehê de li Wiyanayê wê destpê bike".

Hans-Dietrich Genscher : "Peymana Stockholmê da xwiya-kirin ku ji alî pêşkevîna çekdaxistinê û kontrola çekan de Yekîtiya Sovyet û hevalbendên wê çiqas dîloz û bi qerar in".

MIRÊKA



Bila Serfirazî Li Wiyanayê Dom Bike

H. Mizgîn

Konferansa Stockholmê fêkiyên xwe da. Bi peymana Konferansa Stockholmê rê ji "Konferansa Ewlekarî û Hevkarî li Ewropa" re vebû. Bi vî peymanê divê mêtûyên Konferansa Wiyanayê hêsatiyê bîn bişafîtinê.

Bi rastî dewletên bîblok di netica Konferansa Stockholmê de rolek mezin leystin. Hêvî ew, ku welatên bîblok di Konferansa Wiyanayê de jî rola xwe ya girîng bidomînin.

Berî sê salan, dema Yekîtiya Sovyet pêşniyariya Konferansa Stockholmê anî, gelek kesan bi çavê negatîf li vî Pêşniyariyê dinihêrtin û wisa bawer bûn, ku wê tu netîceke nede. Lê belê wek wan kesan nebû. Aştîxwazên dîloz biserketin û rûyê şerxwazan reş kirin.

Fêkiyên ku bi peymana Konferansa Stockholmê bidest ketin, di çekdaxistinê de gawe e. Divê li Wiyanayê û a girîngtir li Cenevreyê ku di konferansa çekdaxistinê de girêdan, pêşkevîtinê nû bîn derxistinê. Di vî babetê de Yekîtiya Sovyet ji niha ve gavên pirr girîng avêtin. Rawestandina ceribandina bombeyên atomî, kêmkirina hejmara leşkerên li Ewropa û heya sala 2000 û plana ji holê rakirina çekên atomî hin ji gavên girîng ên Yekîtiya Sovyetê ne.

Li hember van gavên girîng ên Yekîtiya Sovyet, Dewletên Amerika Yekbûyî çî kir? Çi gavên girîng avêt? Erê hin "gavên girîng" avêt. Lê bi van "gavên girîng" aştîya dinê pirtir xist bin xeteriyê. Ceribandina bombên atomî domand û projaya "şerê stêrk" pêşde bir. Fuzeyên atomî yên nû li Ewropayê bi çî kir.

DAY ji bo ku danûstandinên ku bi kêrî aştîya dinê tînin, xira bike çî ji dest tê dike. Biryara Derkirina 25 diplomatên Yekîtiya Sovyet minakîyek e. Ji bo ku casûsên xwe bi serbestî ji Yekîtiya Sovyet derxe der, aştîxwazan bi pêkneanîna civîna Reagan-Gorbaçov tehdît dike.

Wisa xûya ye, ku monopolên endûstriya çekan yên DAY naxwazin li ser aştîyê tu lihevhatin çêbibe. Ji ber ku lihevhatinek wuha li dij menfeetên wan e.

Rewşa navnetewî hê jî were ye ku wek li ser agir be. Têkoşîna aştîyê, loma divê ji do zêdetir û tekûztir bî domandin.

Ber bi Yekîtiya Hêzên Filistîn de Gavên Nû

Sê hêzên Filistînî li Pragê peyman girêdan ku ji bo pêkanîna yekîtiya berfireh a RRF (Rêxistina Rizgariya Filistîn) li dijî emperyalîzmê, siyonîzmê, teslîmiyetdariyê xebatek muşterek bidin.

Di nabêna 1-5'ê Îlona 1986'a de, FETAH, CDRF (Cepha Demokratîk a Rizgariya Filistîn) û PKF (Partiya Komunîst a Filistîn) li Pragê hatin nik hev û li ser problem û rewşa gelê Filistîn û RRF guftûgo kirin. Di dawîya guftûgoyan de beyanek muşterek hat belavkirin ku tê de tê xwuyakirin ku ev hersê hêz jî bo yekîtiya hêzên Filistîn û helkirina pîrs û pîrsgerêkên doza Filistîn di gelek nuxtên girîng de gihastine hev.

Nuxtên girîng ku ji bal hersê hêzan ve di peymanekê de hatine girêdan, bi kurtî ev in:

Karmêşandina li gor program û biryaran civîna meclîsa netewî ya RRFê yê ku bi beşdariya hemû terefan pêk hatibûn, redkirina pla-

nê Reagan, Camp-Dawid pêşniyariyên otonomiyê û biryar YM a 242'ya, parastina mesela Filistîn li ser esasê ku gelê Filistîn vegere li ser erdên welatê xwe, dewleta xwe ya serbixwe damezrîne. Ji bo aştîyêk adîlî Rojhilata Navîn de, dozîkirina konferansek navnetewî ku RRF jî wek hemû terefedaran, bi serbixwîyê di vî konferansê de beşdar bibe. Divê bî parastin ku bes her RRF, nîmînendê meşrû yê gelê Filistîn e, û li dijî derxistina alternatîfên nuh bî rawestandî. Pêkanîna yekîtiya hemû hêzên rizgarîxwaz li ser erdê dagirkirî, xurtkirina peywendiyên RRF bi hêzên rizgarîxwazên Erebe, li dijî emperyalîzm û siyonîzm û teslîmiyetdariyê. Li dijî emperyalîzm û

siyonîzmê, li ser esasê tekoşîna netewî ya muşterek, hewldana danîna peywendiyên biratî û dostaniyê bi Sûriyê re, pêşdexistina peywendiyên bi hêzên rizgarîxwazî û pêşverû yên cihanê re, bi Yekîtiya Sovyet û welatên sosyalîst û welatên bîblok û welatên musulman ên Afrîka re, li ser esasê tekoşîna jî bo ku RRF bibe cebhek berfireha netewî, divê berpirsîyarên karbidest li gor peymana Aden û Cezayîrê, xebat bikin da îdare û sazûmanên meşrû yên rêxistinê bi hemû awayî bîn avakirin.

Hersê hêzan li ser van esasan bangî hemû hêzên Filistîn kirin ku ew jî ji bo yekîtiya netewî hewlbidin.



Naif Hewatman û Yaser Arafat di civînekê de

LI BANGLADEŞÊ MILYONEK ZAROK KOR IN

Li gor raporên Wezîrê Tenduristî li Bangladeshê di nav zarokên bin 6 salî de, milyonek zarok kor in. Wekî salix didin sedemê vî yekê kêmbûna vîtamîna A ye. Kêmbûna vîtamîna dibe sedemê nexweşîya "kseroptalmia". Wekî tê zanîn birçîtî û kêmbûna vîtamîna li Bangladesh gelek fireh e.

Li gor agahdariyên vekolîna ornîzasyonê tenduristî her sal 30.000 zarok jî kor tîne dinê.

BRÛKSEL

Protesto li dijî hukumeta Tirk



Protesto li ber derê civînê

Wekî tê zanîn Tirkiye jî zû ve ye, dixwaze bibe endamê Civaka Ewropa ya Ekonomîk. Îsal jî ji bo endamtiyê xwest muraceatî CAE bike.

Roja 16'ê Îlonê, KKDK (Federeasyona Komelên Karkerên Demokratên Kurdistanê), KOMKAR, Komelên Yunaniyan û Yekîtiya Ermeniyên bi hev re, li dijî muraceata Tirkiyê, li Brûksel

Mitîngek (demonstrasyon) çêkirin. Beşdarên protestoyê jî endamên Civakê xwestin ku endamtiya Tirkiyê neyê qebûlîkirin.

Di mitîngê de li ser navê herçar rêxistinên bi Almanî, Fransîzî û Yunanî axftinek hat kirin. Di axaftinê de hat nîşandan ku Tirkiye, siyasetek êrîşkar a dagirkerî dimeşîne, Kibrisê xistiye bin îşgala xwe, qetlîama mezin a Ermeniya

înkâr dike, li dijî gelê Kard siyasetek nijadperest û sovenîst dimeşîne û li Tirkiyê demokrasiyê nîne. Jê pêştir, li ser navê van komele û rêxistinên pêşniyariya biryarekê hat pêşkêşkirin ku têde, li ser nuxtên jêrîn hatibû sekinandin: Divê xwînxwarî û zordariya ser miletê Kurd bî rawestandî û mafê wî yê jî bo qedera xwe bi destê xwe tayinkirinê bî naskirin, îşgala ser Kibrisê bî hilanîn û Tirkiye vegere demokrasiyê. Ji hukumeta Yunan hat xwestin ku eger ev tişt pêkneyên, bira pêşniyariya Tirkiyê ya ji bo endamtiyê veto bike. Nîmînendê Hukumeta Yunan, di civîna CAE'ê de li gor daxwazên KKDK, KOMKAR, Komelên Yunan û Yekîtiya Ermeniyên bîr û baweriyên xwe da xuyakirin û got ku Tirkiye muraceata xwe ya resmî pêşkêş bike, emê mafê xwe yê vetoyê bikarbinin.

Bila vebûna civîna 41'an a NY ji bo aştîya dinê gawe be

Netewên Yekbûyî 16'yê Îlonê dest bi xebatê kir. Di rojê ya NY de 140 madde hene û piraniya van maddan li ser aştîya dinê ye.

A herî girîng ew e, ku Netewên Yekbûyî di vî civîna xwe ya 41'an de bi awakî rastî giraniya xwe bide ewlekariya navnetewî. Weke ku tê zanîn, welatên sosyalîst jî bo ewlekariya navnetewî pêşniyara afirandina sistemekê kirin. Afirandina sistemekê wîha watiniya hemû welatên dinê ye. Netewên Yekbûyî rêxistina hemû dewletên dinê ye. Ji ber vî yekê jî hêvî ew e, ku NY di vî civîna xwe de himê aştî-

yek daimî bavêje. Eşkere ye, ku aştîyêk wuha girêdayî pêşdebirina danûstandina leşkerî, siyasî û aborî ya navnetewî ye.

Rawestandina ceribandina bombeyên atomî beşek ji problemên jorin e. Yekîtiya Sovyet salekê ceribandina bombên atomî rawestand û vî biryara xwe heya 1-ê Çileyê Paşîn a sala 1987-an dirêj kir. Lê belê Dewletên Amerika Yekbûyî di vî demê de weke ku tu tişt nebûye, ceribandina bombeyên atomî domand û hêjî didomîne.

Dîsa rawestandina biçekkirina

esman perçek aştîya dinê ye. Pêşniyara Yekîtiya Sovyet "Aştîya Stêrk" e. Di hemû dinê de ev daxwaz roj bi roj bi qewet dibe û gelên dinê bi devekî vî daxwazê dikin. Ji vî yekê jî divê Netewên Yekbûyî di vî babetê de gavên baş bavêje.

Gelên avakirina ewlekariya navnetewî û çekdaxistin, heremên ji bombên atomî azad û heremên aştî, garantî jî bo welatên ne xwedî bombên atomî li hêviya bişafîtinê ne. Hêvî ew e, ku civîna 41'an a NY biserkeve.

Sosyalîzma Real

Aboriya Sovyet Pêşde diçe

Programa PKYS a ku di Kongra 27'an de hat qebûl kirin, daye ber xwe ku heya sala 2000 hatina netewî bigrê du qatan. Di navbera salên 1981-85'an de pêşdeçûn %3,1 bû. Di navbera salên 1986-90 de wê bibe %4,1 û di navbera 1995-2000 de jî wê bibe %5,0.

Di navbera 1986-90 de hilberî-

nên hemû endûstriyan de %25 zêde bibin û di vî demê de hilberîna atolyeyên mekanîk %43 zêde bibin.

Yekîtiya Sovyet par 13.200 robot çêkirin. Heya sala 1990 de çêkirina makîneyên hacetan %100 û çêkirina komputer jî %40 zêde bibe.

Hilberîna endûstriyên kîmye-

wî, mîkrobiyolojî, petrokîmyewî heya sala 1990 wê %35 zêde bibin. Hilberîna kîşt û kal (zirazî) wê 2,6 qat zêde bibe.

Di vî qonaxa pêncsalî de (1986-90) de 1000 mîlyar ruble bête serf kirin. Nivê van peran wê jî bo bilindkirina seviya jiyanê gelên Sovyetê bî serf kirinê.



Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

KARLANÊ ÇAÇANÎ

-4-

HURMETA KURDAN JI BO DÎNÊ ERMENIYA

Wekî me got, Kurda gelekî qedrê ruhaniyên (mîrovên dînî n.m.) Ermeniyên digirtin û dostaniya wan gîhaştibû dereceke wilo, ku her dîreke Ermeniya ji bo Kurda ciyekî ziyaretê hesab dibû. Heke Tirkêkî ya yekî dîtir bi niyetek xirab nigên xwe bavêta dîreke Ermeniya, Kurd hazirbûn, ku xwîna xwe birêtana. Dîrokzanê Ermeniya Daranaxsî wiha dinivîse: "Bîrek Kurdên cendbaşî dîkevin Dêrên Çiyayê Spûhê, kîtebên rûhanî, hebûna dêran û çî yê dîtir ku hebûn talan dikin, ji xwe re dibin welatê xwe. Li vir Kurdên cî, bi ser wan cendbaşîyan hêrs dibin, ji wan re dibêjin, ku we dêrên Ermeniya talan kirine, lê pak bizanin, ku emê ji bo vê yekê ziyane bikşînin. Cendbaşî vî yeka ku kirine, hiltînin ser xwe. Kurd hûrmûrê dêran ji wan distînin, vedigerin Çiyayê Spûhê, hûr-mûr paşde vedigerînin û rica dikin, ku bibexşînin." (19) Rast e li vir, bi fikra Daranaxsî, tesîra vegeandîna hûr-mûr, hukmê rûhanî bû, lê bi texmîna me divê em ji bîr nekin, ku ya herê sereke wê nêzîkbûna Kurda ya dostaniyê ber bi civaka Ermeniya bû.

Di derheq dostaniya Kurda û Ermeniya de, her ûsa dîrokzanê Ermeniya A. Alpoyacyan jî rind xeber dide. Ew li ser peywendiyên wan ên sosyal-ekonomîkî jî disekine û dide eşkerekirin, ku bi taybetî, tevgerêdana wan a rûhanî her ku diçû dostaniya wan tekûztir dikir. Wekî ew dibêje: "Di qeza Mûşê de gelek gundên Kur-

da yên ku gelekî nêzî Ermeniyên bûn, hebûn. Bineliyên wan diçûn ser mezalê S.Mêrop, dua îbadet dikirin, dêrên Ermeniya dihebandin." (20)

Di derheqê yekê de nivîskarê Ermeniya yê bi navûdeng Raffî dinivîse, ku: "Çî eşyayên rûhanî yên Ermeniya diketin dest Kurda, wan, ew xirab û pûç nedikirin. Ji bo Kurda rûmeta her eşyayê dîreke xapareziyê, qasî wan nivîstên ku şexa dabûn wan, mezin bûn." (21) Vê yekê her ûsa kovara Ermeniya Araks jî îbat dîke. Ew wiha dinivîse: "Qeza Xarazmê yan jî Xîrzanê ya ku li ser dupara bela dibû û nêzîkî Tavlorkê ye, ziyaretê diket nava wê û Çiyayê Maratûkê. Ne ku tenê bineliyên cî, temamiya bineliyên Sasonê yên Ermenî û Kurd jî diçûn ser wê ziyaretê." (22)

Di derheqê dostaniya civaka Ermeniya û Kurda de û derheqê ku çawa Kurda qedrê wekilên rûhanî yên Ermeniya digirtin de, di xebata xwe ya rêwîtiyê de tebiyetzanekî welatê xerîb Pîton de Tournefort dinivîse, ku sala 1702-a, wexta tê Rohilata Nêzîk ji bo di Tirkîyê de rêwîtiya xwe bike, ji hukumetê rica dîke, ku beledêkê (belga musade rêwîtiyê di nav welatê de n.m.) bidin wî. Hukumet beledê didê, lê ji bo çûyîna Kurdistanê wekîtiyê nade ser xwe. Bi taybetî, li Erzîrûmê wextê ew dixwaze here dorberê çemê Feratê bigere, qaymeqamê Erzîrûmê, eşkere dibe, ku ew ji derveyî Erzîrûmê nikare hukim li ser wan Kurdên derûdo-

rên Feratê cîwarbûyî bike. Ew ji Tournefort re dibêje, ku her tenê keşîşê dîre Ermeniya dikare alîkarî pê bike, çimkî Kurd gelekî qedrê wekilên rûhanî yên Ermeniya digrin û ew ûsa jî dîke. Tournefort di xebata xwe de, bi hurgilî dostaniya civaka Ermeniya û Kurda dide kîvîşê û dide xuyakirin, ku Kurd çawa dijîminatîyê bi Tirkîya re dikşînin, lê qedrê Ermeniya bilind digrin. Tournefort, tevî keşîşê Dîra Sor ber bi çemê Feratê bi rê dikeve, bi rê ve tim rastî Kurdên ku gelekî hurmeta wan rêwîtiya digrin, tê. Tournefort, ji keşîşê Ermeniya dipirse, ku ew çî hewalê, ew cewabê dide: "Dostaniya me û wan (Kurdan K.Ç.) gelekî kevn e." Paşê Tournefort dinivîse, ku wê qedirgiriya Kurda ber bi keşîşê Ermeniya, me ji her qezayekî xelas kir. (23)

Wekî me got, Kurdên Dêrsimê jî bi qedirgiriyanek mezin ber bi dêrên Ermeniya dibûn, diçûn ber wê, hurmet û qedrê ruhaniyê digirtin, wekî Êrêwanyan dibêje: "Çîqa xapareziyê ji îslamiyetê dûr e Kurdên Dêrsimê jî hewqas dûr in. Ew tu caran nîmêj nakin, tu caran nahêlin, ku Tirkêk nigê xwe bavêje dêrên Ermeniya û heke ew vê yekê bi zorê bikin, Kurd hazir in xwîne birêjin." (24)

Eger biqewimiya, Tirkîya hicûmî ser gundekî Ermeniya bikira, yan jî biketa dîra wan, temamiya Kurdên Dêrsimê li hember wê yekê disekin û nedihîştin vê yekê bê kirinê. Dîra gundê Havlorê ya S.Karapêt bûbû ciyê Kurda yê ziy-

aretê, wan ûsa qedr û hurmeta wê dîrê digirtin her wekî ya ziyaretê xwe bigrin. Wê mîsal, wextê sala 1888-a dîrokzanê Ermeniya Andranîk diçe gundê Havlorê, li wir rastî keşîşê dîra S.Karapêt tê. Ew li wir gelekî qise dikin. Ew derheqê dostaniya civaka Ermeniya û Kurda bi qedirgiriyanek mezin xeber dide, di derheqê qewimandinekê de wiha dibêje: "4-5 sal berî niha, di nav mimesilên hukumeta Tirkîyê yên li Xozatê rûdiniştin, bahs bela dibe goya bi zêrê dîrê (ya S. Karapêt K.Ç.) bineliyan çek û cebîrxane bi dest xistine, ji bo ku hicûmî ser qezayên Tirkîyê yên dora Dêrsimê bikin. Qaymeqamê Xozatê biryar dide, ku eskerê wan here tekeve dîrê û di derheqê yekê de rastîyê hîn bibê. Sereskerê belûka Xozatê qayil dibe û ew bi rê dikevin tîrê ber bi dîra me de... Min dît waye ji nişkê ve eskereki gumreh ketiye gîlî, pêşiyê min tê derneexist ew çî hewalê. Min gazî birê xwe kir û gotê çîka binhêre ew çî eskerê e ji çiyê ber bi gîlî ve tê. Hê birê min ji mal derneketibû, min hew nihêrî, ku sîleh di destê Kurda de ji malên xwe derketin û li hemberî wan şer kirin. Ji Kurda tîrê, dîsa eskerê Tirkîya dixwaze hicûmî ser Dêrsimê bike. Kirin hewar, gazî, nava hewê de deng bi bez bela bû, me hew nihêrî, ku Kurdên çekdar, cuda cuda bi serêqebîlên xwe ve li vir hazir bûn..."

Eskerê Tirkîyan jî çiyê peya bûn, lê Kurda pêşiya wan girt: "Hûn kî ne, ji bo çî hatine, çî dixwazin." (Dîm dîke)

Bîranînen Generalekî Tirk



Cemal Madanoğlu
Wergêr : Alîşêr

-4-

Bi ber êvarê re em gihîştin Cizîrê.

Piştî ku em gihîştin qezayê, fermanberê taburê kete mala xwe, ma di hundir de û carek din derneket.

Wisa dihat xuyakirin, ku nexwêş bû... Serbazên taburê, ji bo xêrhatinê, hatin pêşiya min. Wezîfa ku ezê bigrim, fermendariya tivingên makîne yên taburê ye; lê, di taburê de du tivingên makîne hene...

Di wan wextan de di taburêke normal de, sê boluk (bêlûk) û bolukek ji tivingên makîne hebûn. Niha li vir sê bolukên sinorê, taximekî tivingê makîne bi du tivingên xwe ve heye. Taburên sinoran, di hêla damezradinê de teng hatiye girtin.

Serbazê ku ez di şûna wî de hatibûm tayînkirin, wî min digerrand. Em li çayxanekê rûniştin û me qehwe xwest.

Qehwe hatin.

Hîn me venexwaribû, ku otomobileke hêşîn a tarî got vûû û derbas bû, der û dorê me di nav toze de ma, min nekarî ez qehwê vexwim.

-Ev kî ye lo? Li vir çawa vî otomobile dîtîye?

-Milazim Alfons e, gotin.

-Milazim Alfons kî ye?

-Serbazekî Fransîzan...

-Çî karê wî heye li vir?

-Dibe, ku diçe cem qeymeqam, axaftinek wî heye.

-Hella, hella...

Her çî hal e, me qehwa xwe teze kir.

Heval (ê navê wî Ethem bû) got ku:

-Ez te bibim ba Fermendarê Taburê.

-Fermendarê Taburê bi min re hat.

-Ew di tebdîlhewayê de ye...

-Ê baş e, kî ye Fermendarê Taburê?

-Celalê Yuzbaşî.

Em bi meş gihîştin qerargeha taburê. Xaniyekî seqat û ji kevn de mayî. Em derketin qata sisiyan. Me li derî xist. Di hundir de yuzbaşiyek rûdinê.

-Tu bi xêr hatî, got, bi zûtirîn dem tu hatî, wekî te xuyakirinê, ku tu serbazekî wezîfeparêz î. Niha ezê emrek tenê bidim te. Ew jî ev e: Dê tu takîma xwe bi çavên xwe bibînî û lê binêrî û bi wî awayî teslîm bigrî.

Ango?

"Ezê hem bibînim û bi çavên xwe lê binêrim" (!) Çekên takîmê û kel û pelên (araç-gereç) wê teslîm bigrim.

Ez derketim derve. Ethem pirsî:

-Çî got?

-Takîma xwe "bibînî û bi çavên xwe lê binêrî û bi wî awayî teslîm bigrî", got.

-Himmm... Were em herin.

Dom dîke

23 Sal Piştî Şehîdbûna Têkoşer Cemal Heyderî



Cemal Heyderî

Îsal, 23 sal di ser şehîdbûna têkoşerê Kurd Cemal Heyderî re derbasdibin. Rejîma BAAS a xwînrêjî di 19'ê Tîrmeha 1963'ya de, wî li sêdarê dan. Cemal Heyderî di salên 40'î de ketibû nav xebata siyasî ya niştîmanî. Yek ji rêberên Partiya Komünist a Iraqê bû.

Cemal Heyderî, jî malbatek

melezade ya bi nav û deng a Kurdistanê Iraqê ye. Sala 1926'a li bajarê Hewlêr hatiye dinê. Xwendina xwe ya destpêkê û ya navîn li Hewlêr xelaskir. Sala 1943'ya çû Bexda, di Koleja Perwerdekariyê de dest bi xwendina bilind kir. Di wan salan de ket nav xebata siyasî. Wêk ku bi xwe bahs dîke, di riya xwendina romana Dayik a

Marksîm Gorkî re aşnabû bi bîr û baweriyên pêşverû û Marksîzmê re peyda kiriyê.

Di salên 1944-45'an de, bi çend hevalên xwe yên Kurd re, ket nav xebata damezrandina rêxistinê Marksîst a Kurdî. Piştî vî karî bû, ku Partiya Komünist a Kurdistan hat damezrandin, ku ji ber navê rojname wê "Şorîş" bû, parti bi xwe jî bi navê "Şorîş" dihat nasîn.

Endamên "Şorîş" ê, piştî demekê bi çend Kurdên welatparêz re yên ji partiya "Hîwa" peywendî danîn. Encama van peywendîyan bi navê Partiya Rizgarî, partiyek qanûnî hat avakirin. Lê "Şorîş" di nehişiyê de hebûna xwe parast. Lê belê piştî damezrandina Komara Demokratîk a Kurdistan (Mehabad), li Kurdistanê Iraqê jî fikrek çêbû ku divê partiyek demokrat wek a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bê avakirin. Ev, bû sedemê dijayeti û nakokî di navbera endamên Rizgarîyê de. Hinekên ji wan, digotin ku, di serokatiya vî partiya nuh de divê nûnerên feodalan û serokeşîran jî hebin. Hîn jî endamên Rizgarîyê (ewên ku ser bi Şorîş ve bûn) biryar dan ku Partiya Şorîş hilweşînin û biçin nav sefên Partiya Komünist a Iraqê. Cemal Heyderî jî yek ji wan kesan bû.

Di sala 1946'a de Cemal Hey-

derî, serokekî jêhatî yê tevgera xwendekaran bû. Di vî salê de piştî numayîşek (xwe pêşandane) mezin a li Bexda, ku li dijî Îngilîz bû, Cemal Heyderî hat girtin 4 meh ceza xwar û ji Kolejê jî hat derxistin. Piştî wê carek din hat girtin. Bi berdanê re Partiya Komünist wî şand Hewlêr û li wir di sala 1948'a de bû berpirsiyarê Komîtê.

Çiriya Pêşîn a sala 1948'a, wî bi çend hevalên wî re li Kerkûk girtin û bendekirî şandin Bexda, Zînadana Ebû Xirêb. Mehkema Eskerî 7 sal hukmê zîndanê dayê. Heta sala 1951'ê li Zînadana Nuqret Selma (li Sehra Başûrê Iraqê) ma. Piştî grevek birçibûnê ya ku 22 roj kişand, karbidestên Iraqê mecbûr man hemû girtiyan rêkin bendexana Bexda yê. Jiyanê zîndanê û îşkencê, baweriyê Cemal Heyderî hê xurttir kir, jê re bû wek medreseyek girîng. Çunkî, firset dît ku, xwendin û zanîna xwe pêşde bibê, fêde ji teoriya Marksîzîm û tecrûbên bizavên rizgarîxwazî bigre.

Sala 1952'a, beşek ji komünîstan li girtîgehê ji Partiya Komünist a Iraqê cudabûn û navê xwe kirin Ala Zehmetkêşan. Di meha Adara 1953'ya de Cemal Heyderî jî zîndanê derket û bû serokê vî rêxistinê. Di sala 1956'a de bi

çêbûna Kongra 2'ya ya Partiya Komünist, parti bû yek û Cemal Heyderî jî bo endametiya politbüro hat hilbijartin.

Her di wê salê de, piştî êrişê sêmilî (Îngilîz, Fransîz û Îsrail) ya ser Misir, çend rêxistinên nehenî (dizî) bergiriya millî durist kirin ji bo piştigiriya gelê Misir û Sûriyê, di êrişê Amerîka û Peymana Bexda de. Cemal Heyderî yek ji rêberên vî bergiriyê bû. Bi vî rola xwe Cemal Heyderî dewrek mezin list di amadekirin û biserketina Şoreşa 14'ê Tîrmeha 1958'a de.

Piştî Şoreşa 14'ê Tîrmehê, Cemal Heyderî rolek eşkere di bizava krêkaran a sendikayî de list. Di nivîsarên xwe yên wê demê de pêwîstî daye nîşandan ku hemû hêz û rêxistinên siyasî divê li ser programekî temam bighên hev. Sala 1962'a, Cemal Heyderî bû Sekreterê Komîta Merkezî û endamê Politbüro ya Partiya Komünist a Iraqê. Her di vî demê de karê komîta rêxistinî ya merkezî jî li ser milê wî bû.

Piştî derba Sibata 1963'ya û bi taybetî ji piştî kuştina Sekreterê Giştî yê Partiya Komünist, Selamî Adil, Cemal Heyderî, li dijî rejîma BAAS serokatiya bergiriyê kir û rêberiya partiyê girt ser milê xwe. Hucrên partiyê yên jihevketî gihand hev.

Di vî xebatê de, dijmîn şopê bir ser. Di rêya çend kesên tirsonek û bawerîşikestî re roja 19'ê Tîrmeha 1963'a ket destê Baasîyan û roja 21'ê mehê, radyoya Bexda fermana li sêdarêdana wî, weşand.

Cemal Heyderî giringî dida bi mesela Kurd û belavkirina edeb û zîmanê Kurdî, bipêşxistina rojnâmegehiya Kurdî. Hê jî destpêka derçûna rojname Azadî, tede beşdarî kiriyê. Di riya Azadiyê re xwestiye bîr û baweriyê Marksîzmê li Kurdistanê belav bike.

Her wiha, li ser bizav û mafên gelê Kurd çend lêkolînên wî jî derketine:

a- Rapora Civîna Komîta Merkezî ya Partiya Komünist a Iraqê-Adara 1962'ya.

b- Çend gotarên ku di kovara Mesela Aştî û Sosyalîzmê de derketine, di bin îmza Cebâr Elî de.

c- Her wiha lêkolînek dîr û dirêj sala 1963'ya amade kir, li ser rola komünîstan ji bo çareserkirina mesela Kurdistan. Lê mixabin ku ew nivîsar hê sala 1973'ya li kovara Sakaf Al-Cadîda (j.47) hatiye belavkirin.

Cemal Heyderî heta nefesa xweyî dawiyê di xebatê de bû û baweriyek wî ya xurt hebû li ser mesele xelabûna welat û bextewariya

Dûmahîk r.7

Çîrok

pîre û çand

Mirina Xalid Begê Cibrî

Demir Ozlu
Wergêr : M. Elî

Çîroka Xalid Begê Cibrî, di kûra-
yiya salan de nuxamtiye. Ji bo me,
yên ku li roava dijîn buyereke ku
nav û dengê wê nehatiye bihistin.
Lê gava hûn ji yekî rojhilatî re qala
mirina Xalid Begê Cibrî bikin, ger
rojhilatî ji piçekî nasdarê der û dora
xwe be, pêre pêre wê çavên wî ji
hev vebin û wê bipirse: "Ma tu
ji kû mirina Xalid Begê Cibrî
zanî?" Lê ne bes kesên giregir,
xelkê wan herêma ji hay ji mirina
Xalid Begê Cibrî heye. Ez jî, li
Mûşê, ji ber meraqa xwe ya li ser
kolozên ku zivistanan, ji heft sali-
yan bigre heta heftê saliyan misê-
wa li serê xelkê ne, pê agahdar
bûm.

Kolozên ku di zivistana xedar
de li serê xelkê bûn, piştî zelzela
Wartoyê wek alikarî ji Pakîstanê
hatibûn şandin. Kolozên tepelika
wan kupiyayî û wek şewqan çar-
medora wan lêhilkirî, kolozên
dûz, yê dirêj, yê pahn yê qir-
belek, yn qehwerengî yê dûz, ên
sipî, yê reş... Min Wartoyê jî dît.

Havîn bû. Ciyekî girik bû. Zel-
zele salek berê qewimî bû. Xanî
hilweşiyayî bûn, xirbên wan hê li
cîh bûn. Hin avayî hê nuh hatibûn
avakirin. Yek ji van, qereqola cen-
dirman bû. Avayiyên din bereqên
textîn bûn. Di nabêna bereqan re
cuh diherikin. Xelk, ew xekê sim-
bêl dirêj û sibêl qalid, liqeraxê
cuhani li qehwan rûdiniştin. Em bi,
hev re rûniştin. Havîn bû, teyme-
nekî naskiriyê me (em çend heval
di alayiya Mûşê de esker bûn) ku
hatibû li ser cuhê masî digirt û
albayekî jî birligek din jî li wir
bûn. Min û teymen silav li hev kir.
Em di nav xelkê de, wî xelkê reş-
tankî de bûn. Wan diavêtin ruhê
karbidestên welêt, piranî elewî
bûn. Pişt re berê xwe dan min.
Min devê xwe venekir. Rûniştî
wilo li ciyê xwe mam bédeng. Ez
esker bûm, tîrsa min ji muxbiran
hebû, ez hê eskereki nuh bûm. Ger
min dest bi axaftinê bikira, divê
min bi dirêjayî biaxifta. Lê dawî-
yê min jî axaft.

Gelo eşîra Xalid Begê li dorhê-
la Wartoyê ye? Ez dibêjim qey
milekî eşîra Cibrî li dorhêla War-
toyê ye. Rutba Xalid Beg, di ordi-
yê de yarbay bû. Li sûka Bedlisê
hatiye dardekirin. Gava ji bo zel-
zela Wartoyê ez hatim û bi wan
kolozên xweşik ên li serê xelkê bîlî
bûm wilo, ez pêrgiyê Xalid Beg
bûm. Ne yarbay Xalid, Xalid Begê
Cibrî. Kolozê Xalid Begê Cibrî,
kolozekî bêhempa bû. Mezin bû,
nexşandî bû, pirça koloz diçirû-
sand. Piştî dardekirina wî, di
mezatê de hat firotin. Mîrên Kur-
da hatin, koloz, bi perê wê gavê
bi 80 zêrî hat firotin. Xwedê zane,
nuha kîjan mîr wî vedîşere? Bed-
lîs bajarekî gelek kevin e. Xelkê
Bedlisê piçekî ji xelkê Mûşê û yê
Wartoyê cûda ye. Bedlîs yek ji
kevintirîn bajarên dinê ye. Di trê-
na rojhilat de rastî çend Bedlîsiya
hatim, esnaf bûn. Li Mûşê û War-
toyê, min qet esnaf nedîn. Belê
Xalid Begê Cibrî di sûka Bedlisê
de hat dardekirin. Şûrê Xalid Beg
di mezatê de hat firotin. Nuha, kî
zane li cem kîjan mîrî ye? Kincên
Xalid Beg, kî zane li nikê ne?
Ez van tiştan, li sûka Mûşê, ji
merivekî ku li ber dikana nik halê

rûniştibû, ji wî hînbûm. Dikan-
dar jî guhdariya wî merivî dikir,
wî ji desdîq kir. Mêrik ji bo Xalid
Begê Cibrî, got "general bû". Li
cem wî, ji xwe jî general bû. Paşê
ez têgihîştim ku mana wê jî çiyê.
Ez vana li sûka Mûşê hîn bûm. Li
sûka Mûşê, ez hîni gelek tiştên din
ji bûm.

Sûka Mûşê, sûkek Wilo ye ku
meriv dibêje qey ji dema navîn de
maye. Bajarê Mûşê bi xwe hew
cadek hevrazî rast e ku ji îstasyo-
nê ber bi bajêr de hildikişê. Riyek
bi kilometran ji îstasyonê heta
bajêr, hevraz lê ripîrast... Îstasyon
li rex deştê -deştê Mûşê ya bilind-
avayiyek piçûk e. Gava em nêzî wê
bûbûn, min nikaribû bir bibira ku
gava meriv bi trêne digihê wê ava-
yiya xweşika delal a piçûk a ku
avabûye di vê deştê fireh a çor de
ku rûbar û çem di nav re diheri-
kin û salê şes meh dibin berfê de
ye, di pişt xwe de çî êş û elemên
însanî veşartî ye û emê li wir pêrgî
çi derd û kulên giran ên merivan
bibin... Rê bi hevrazek sivik xwe
digihîne bajarê paldayî çiya. Dora
wê vala ye, bes li rex îstasyonê
çend avayiyên ji bo memûrên îsta-
syonê avakirî... Dû re, li her du ali-
yan avayiyên ji bo felaketzêden
Wartoyê avakirî... Gava meriv
nêzî bajêr dibe çend atolye... Bi vî
awayî rê digihê bajêr, heta meyd-
ana ber qonaxa hukumetê diçe, li
wir bi du aliyan de ji hev vediqe-
te. Pişt re dikeve nav sûka dema
navîn a wek niv çemberkekê.

Li van doran, dikan yek yan du
qatî ne. Di nav de avayiyên kevin,
yên bi kemer, bi pencerên hesinî
û ji keviran avakirî jî hene. Ên
cawfiroş, xalî an betanîfiroş, van
kelapûran ji Entabê tînin. Lê gava
hûn bi kûrayî lê bikolin, dixuyê ku
kilîmek bi navê Xaliya Kurd heye
ku gelek qalind e, kevin nabe, çî
qas sal di ser re derbas dibin hew-
qas xweşikîr dibe, ji ber rengên
wê çavê meriv ranedibû, nexşên
wê bêhempa ne: Hemû rengên
xwerû Kurdî, lacîwerd, mor, sor
hemû li ser in. Li dikanê kelapû-
rên ji Îstanbol, Sûriyê yan ji Îranê
hatî, tije ne, eletirîka destan, kêrik,
seetên Çînî yê sadeyiya wan
bêhempa, seetên Rûsî, îskanên
Fîransîzî, teyîfîkên Îranî.

Xelk titûnê dipêçe û dikêşe, ku
ji xerîbekî hezbike, dipêçe dide wî
jî. Ev titûneke zer a qaçax e, nişa-
na Şahê Îranê li ser kaxizê wê ye.
Li sûka jor di fetloka riya sûkê de
-piştî ku meriv ji Camiya Mezin
a avayiya dewra Selçûkiyan derbas
dibe- li dikanên milê rastê, deban-
çe jî hene, ne di camekanan de ne,
ji hundir tîne xwestin, ku meriv
nas bikin, hê gîşî nişê ku vê paşî-
yê hatiye nefrotibin didin.

Malmezînekî Kurd li havînge-
ha xwe ziyafetek dabû, em jî ezi-
mandibûn, yê ezimandî li dora
sed kesan bûn. Gava dest bi vexa-
rinê bû, di nav kesên din de, bi ser
min de qirîya.

"Te xwe eşkere kiriye" got.
"Ji vir (em li palê bûn, li wî aliye
dolê palek din hebû) divê tu biçî
wir, wê havîngeha wir, lê di bin
erdê re, bîyî ku xwe eşkere bikî."

Wî guman kiribû ku ezê xwe
paş de vekîşînim an di devê xwe
de bixumxumînim. Min got: "Ez

ji xwe eşkerekirina xwe natirsim.
Ji bo fikrên xwe min mirina xwe
girtiye ber çavê xwe."

Min vê yekê ji nişka ve gotibû.
Ji ber xwe ve derketibû. Piştî wê
mîr îhtîrama min girt. Li bajêr jî
herçiqas, tim li pey şopa me bûn
jî, êdî tu kesî bi çavê xwar li min
nenihêrî.

Piştî xwarinê, gava ez li bin darê
vezeliyayî bûm, Mîr hat ba min.
Yek bi yek behsa bîr û baweriyên
siyasî yê hemdemî kir. Ferhengê
dîn bi kar dianî, lê hemûyan bi
eşkeretiyek bêhempa zanibû: Sê
jinên wî, du mavzêrên wî û tîvin-
gek wî ya M1 a piyade hebû. Pişt
re, gava ku di nava teva de axaft,
ez têgihîştim ku cûdatiya di nabê-
na dîtînen min û wî de ji hoyên
dîrokî, ji cûdayiya azînen Tirk û
Kurdekî tê.

Li sûkê, zînekî çermînî gelek
hêja hebû. Bi sed lîrayî dihat firotin.
Hewqas dilê min pê ve bû jî
lê min nikarî ji xwe re bikirim.
Perê min kêmbû. Zîn gelek sade
bû, çerm û koselê wê pir xweşik
bû.

Li sûka jor gelek tiştên çermîn
hebûn, qayîş, rext û êlekên neçîr-
vanan...

Li îstesiyona Mûşê qehwek jî
heye. Bi roj jî gava ne seeta trêne
bi jî -trên ji heftê çend rojan tê-
meriv dikare bêje ku qerebalix
(boş) e. Li hundurê vê qehwê, nêzî
derî daliqandî du rismên xelkî
hene. Di rismekî de Hezretî Elî,
bi hespê xwe di ser camiyê re difi-
re. Di yê din de cardin Hezretî Elî
heye. Reng jî, bicîhkirina şiklan
jî ecêb xweş in. Resamekî nenas
ê ku demekê di hefsa Mûşê de raza-
ye, çêkiriye.

Li bolukê ji bîlî Kurdên din,
yekî bi navê Xelîlê Cizîrî jî hebû,
Tirkî nizanibû.

Gava te digo, "kekî bana bîr
resîm yapsana" (kekê ka ji min re
rismekî çêke) tê digihîşt.

Neynika xwe derdixist, girove-
rikek dixêzikand, ev girover dibû
serê keçika mar, dûmahika risim
bê neynik çêdikir. Her gav wî ris-
mî, rismê "Keçika Mar" çêdikir.
Bes her carê rengên risim cuda
bûn.

Xelîl Korkût Cizîrî bû. Qaçaxçî
bû. Gava ku em derdiketin tîving
berdanê û dîrsa mayinan ruyê wî
dikeniya. Di tîving berdanê de her
gava ku berdida, li navika hedefê
dixist. Hilkişandina mayinan, ji
xwe karê wî bû. Ji temenê xwe
mestîr xuyadikir. Yekî reşotankî
bû. Gava bihist li Cizîrê Şêx Sey-
da miriye, ji qudûm ket. Di roj-
nama destê min a Akşam de rismê
Şêx Seyda dît, ji bo rism bigre
xwest penci lîre bide min. Gava
min got rojname 25 quruş e,
bawer nekir. Çewa dibû, ku ris-
mê Şêx Seyda hewqas erzan bidest
keta? Min rism jêkir da wî. Xist
paşila xwe. Dilê kesî nedihîşt. Li
hember despotîzma dor xwe, ti bin
simbêl re dîkeniya. Loma jî roje-
kê teymen îdîa kir ku henekê xwe
bi herkesî dike. Xelîl Korkût li
hember vê peyvê xwe li nezanîne
danî. Heta dawiya eskeriya xwe,
wuha kir ku xwedêgiravî hiç ji
Tirkî fam nake û ne mumkun e ku
fêr jî bibe. Aştîxwazekî rastîn bû.

Di boluka Neco de Kurdekî
esker ê din hebû. Tirkî nizanibû.
Pir extiyar xuya dikir. Erdê wî jî,
dergistiya wî jî axa jî dest girtibû.
Bêkes bû. Hatibû eskeriyê. Paşê
eskeriya wî xelas bû. Min wî bi
kincên wî yê sivil li îstasyonê dît.
Gava wî min dît, hat cem min. Bi
Tirkîya xwe ya ku hinekî fêr bûbû
got: "Êdî diçim". Wer kir, wek
bi destê xwe îşaret bike.

Diçû başûr, Iraqê. Min zanibû.
Neco ji min re gotibû. Ez kêfx-
weş bûm ku li îstasyonê bawerîya
xwe bi min nişan da. Bejna wî
kinik, pantolonê wî fireh bû. Unî-
forma xwe derxistibû, bûbû wek
herkesî. Ne xweşik bû. Lê pirani-
ya Kurdên ku dadiketin îstasyonê
jî û yê ku dadiketin sûkê jî xwe-
şik bûn.

Gava ji bo manewran em diçûn
çiyayê Agirî, me zarok û extiya-
rên di xweşikîyê de bêhempa
dîtin. Li çiyê, gava ku me kamp
vegirt, gundiye Kurd ê bejin dirêj
Husên Elîk got ku em hatine nezi
gundê wî. Qumandarê bolukê
rojek îzin dayê, çû gundê xwe,
paşê vegeriya.

Di alayê de borazanvan bû.
Gelek dirêj û reşotankî bû. Piştî
heftekê gava em vegeriyan qîşlê
agirê wî zêdebû, te digo qey di nav
agir de dişewite. Pir saxlem bû.
Wî qebûlî rewirê nekiribûn. Agi-
rê wî zêde bû, wek firnê dişewitî.
Ez têgihîştim ku ev bes ji hesretê,
ji hesreta dîtina bistikekî gundê
xwe bû. Me ji nuh ve wî rakir
rewirê. Başçawîş em neşikandin.

Gava ku Kurdek tezkere digirt,
bi şev Kurd diciviyan. Çêmasî-
ya wî hebûna temam dikirin:
gomlek, pantolon, pere. Havînan,
esmanekî çiksayî çêdibû. Hewa pir
xweş bû. Lê zivistanan meriv nika-
ribû li derve bisekinîya, pir sar bû,
di xwarinxana kerpiç de meriv
diciviya.

Camiya Mezin, camiyek awayê
Selçûkiyan bû. Xweşik bû, rengên
kevîrên wê, meriv digot qey qeh-
werengiyê vekirî ye. Li dora wê
eşyayên memûrên ku ji bajêr bar-
dikirin dihat firotin. Xortên Kurd
yên ku ji gundan dihatin, li wir li
hêviya krêkarxwazan disekinîn. Lê
gelo çî krêkarî? Di bajêr de atol-
yek piçûk jî tunebû. Li wan deran,
piçekî li jêr min jinek Kurd a pir
xweşik dît, zerîya bejindirêj a por-
dirêj bû, heta tu bêjî xweşik bû,
xwe ne nuxamtibû, bi du mîrikên
Kurd re diaxaft.

Di kuça ku ber bi Camiya
Mezin vedibû de, du xanên teng
ên kevîrî, hê ber bi jêrtir çend
qonaxên banê wan ji axê lê mezin
û kerpiçîn hene. Hema piştî fer-
mana Ermenîyan, ji bal dewletên
cîh ve hatine avakirin.

Li riya sûkê jî xaniyên ji kevi-
ran avakirî hene piçekî ji Camiya
Mezin bi wê de mizgeftêk din jî
heye ku li ser her du qoziyên jor
ên deriyê baxçê heykelên şêran
hatine bicîhkirin: Camiya Alaed-
dîn. Hê wêdetir cuhok, rexchuhok,
daristan, xaniyên ji çamûrê avaki-
rî dest pê dikin. Gava meriv ber
bi girê ku bajêr hildikişê ve diçe
jî êdî tiştek tune. Li jor axayên
xwedî pez rûdinên, ew di esasê
xwe de qaçaxçiyên pez in, xani-
yên wan ên çamûrîn hê mezintir

Dûmahîk r. 7

HINDIK

RINDIK

WÊ ROJEKÊ...

Endamê cûntayê general Tahsîn Şahînkaya her cara ku
bertil -ruşwet- digirt, dibir dida pîreka xwe û digot: "A
ji te re van perana veşêre..." Lê jînekê jî her car jê pîrs
dikir, digot: "Ma çiqas e?" Wî jî digot, "Qîzê lê mepir-
se!, tu bibe veşêre." Rojekê cardin bir pêşek pere da jî-
kê û disa wek hertim, got "veşêre". Vê carê jînekê xwe
ranegirt:

- Ma malava, tuyê hercarê binî pêşek pere bidî min û
bêyî ku em bizanibin ka çiqas e... Hema meriv li erdê
jî bibîne, divê meriv cardin bijmêre.

Tahsîn Şahînkaya got:

- Qîzê ma ezê çî bijmêrim, ji xwe hey wê rojekê derke-
ve meydanê, wê demê tu'yê jî fêr bibî ku min çiqas bertil
girtiye.

DEMA LEŞKER BIBE SEREK-KOMAR...

Li gundekî Mêrdînê bekiçiyê gund mamostetî dikir. Rojekê
ji bavê zarokan yek, çû dibistanê. Bala xwe dayê ku bekiçî tivin-
ga xwe sipartiyê kêleka textê reş û hin tiştan ji zarokan re dibê-
je. Mêrik şaş ma û jî bekiçî re got:

- Ma qey tu mamostetiyê dikî?

- Çima leşkerêk dikare bibe Serokkomarê Tirkiyê, ma ez bûme
mamostê gundekî qey pîr e?

NE XWEZÎ, NE JÎ PERE...

Dibên li Anqerê cezayê tûkirina erdê 500 kaxetê Tirki-
yê ye. Mirovek li bajêr rastî çawîşê belediyê hat:

- Bibore, minê tiştêk bipirsîya... Gelo cezayê tûkirina
ruyê "însana" çiqas e?

- Li vî bajarî merivên ku tu tûkî ruyê wan hewqas pîr
in ku ji bo vê yekê ne xweziya te qîm dîke û ne jî perên te...

PIRAMÎT Û DEMOKRASÎ


Sefîrê Misrê yê Anqerê li oda Wezîrê Derva yê Tirkiyê rûniş-
tibû. Çavê sefir li ser masê li rojnamekê ket. Rojname li ser hil-
bijartina Misrê bi tîpên mezin wisa nivîsandibû:

"Di bin siya piramidên de derbasbûna demokrasîyê."

Sefîr rojname da dest xwe, demek kurt bala xwe dayê û
mizici...

Wezîr jî sefirê Misrê re got: "Tu bi çî dikenî?"

- Ez bi vî nivîsa rojname we dikenim. Gotiye di bin siya pira-
midên de derbasbûna demokrasîyê! Çewt nivîsandine, divê bini-
vîsandana, "Di bin siya leşkeran de derbasbûna demokrasîyê".
Ma ne were ye?



- 1 Cotmeh 1962 : Kovara Dicle û Firat li Îstenbolê derket.
- 2 Cotmeh 1908 : Kurd Teavûn ve Terakî Cemiyetî (Kome-
la Alîkarî û Pêşketin a Kurd) li Îstenbolê hate damezirandin.
- 6 Cotmeh 1958 : Mele Mustefa Barzanî tevî hevalên xwe
ji Sovyet vegeriya Kurdistanê Iraqê.
- 7 Cotmeh 1926 : Serîhildana Qoçan.
- 7 Cotmeh 1927 : Têkçûna Serîhildana Bîcar.
- 8 Cotmeh 1930 : Serîhildana Pulumur.
- 9 Cotmeh 1956 : Şêx Mahmûdê Berzencî çû dilovaniya

xwe.

10 Cotmeh 1922 : Şêx Mahmûd Berzencî Li Suleymaniyê
serbixweyiya xwe îlan kir.

10 Cotmeh 1924 : Yek ji berpirsyarên rêxistina Azadî, Yusuf
Ziya hat girtin.

13 Cotmeh 1970 : Li Erxenê şûba DDKO (Komela Kulturî
ya Şoreşger a Rojhelat) vebû.

14-15 Cotmeh 1978 : Kongra DDKD (Komela Kulturî ya
Şoreşgerên Demokratî) ya yekem li Diyarbekir civiya.

22 Cotmeh 1984 : Şaîrê Kurdê mezin Cîgerxwîn çû dilova-
niya xwe.

23 Cotmeh 1913 : Kovara Hetawî Kurd derket (xwediyê
wê Babanzade Abdûlezîz bû).

26 Cotmeh 1919 : Serîhildana Şêx Eşref destpêkir.

30 Cotmeh 1918 : Peymana Mondrosê hat îmze kirin.

31 Cotmeh 1985 : Pîsporê zîmanê Kurdî Prof. Qanadê Kur-
do di 76 saliya xwe de çû dilovaniya xwe.

Cotmeh 1882 : Sultan Abulhemît jî ber tîrsa serîhilda-
nê, Şêx Ubeydullahê Nehrî surgûnê Mekkeyê kir.

Ç.Pêşîn 1965 : Kovara "Çiya" li Ewropa derket.

DÊRSIM CARDIN DI BIN SUNGIYA DE

Li vî gundî, bi hawakî barbarî 9
hevalêr TKP/ML TÎKKO bi ser
hev de kuştin. Û dû re jî dora
hemû Dêrsimê girtin, bi heftan
têkiliya wê û her derê jî hev birîn.
Cardin bi sedan kesên pêşverû gir-
tin û îşkence kirin.

NE EV TENÊ YE

Bêgûman li Dêrsimê hovitîyên cûntayê ne bes ev in. E wan ji bona gelê Dêrsimê "qanûnên" taybetî derxistine. Ya rastî vana fermanên Dêrsimê ne. Fermandar ji Waliyê Dêrsimê Kenan Guven e. Heta îro bi rîya van fermanan bi hezaran kes û malbatên welatparêz bi darê zorê ji Dêrsimê hatine derxistin û li Rojavayê Tirkiyê hatine bi cikirin. Heta vê dewleta hov, gelek kes di ber zaroyên wan de girav (rehîn) girtine û li bajarekî din mecbûrî îskanê kirine. Û ji ber van hovîtîyên hêzên kolonyalist li gor îstatîstîkên dawî nufûsa Dêrsimê 5 hezar kêm bûye.

Lê kirin û marifetên Wali efendi bes ne ev in. Wali Kenan Guven dema ji derkê derbas dibe, divê her kes ji ber qam bikin. Çendakî berê Wali li ber Parqê derbas dibe, xortekî nuh ji Almanyayê hatî li wir rûniştiye ji ber ranabe. Li ser vê yekê Wali, xort dide ber sîla (şirmaqa).

Li gor axaftin û beyanên Wali Kenan Guven, em fêrdibin ku wî listak kesên pêşverû û demokrat derxistiye. Yek be yek ban wan dike û ji wan daxwaz dike ku gişt bibêjin "Ez Tirk im, ne Kurd im". û divê vê yekê jî ne bi devîkî, bi nivîs bibêjin. Wali K. Guven jî muhendîsekî YSE (şirketa dewletî a rê, av, elektirîkê) re wisa dibê: "Ji min re bibêje, te maşê xwe ji ku girt, ji Komara Tirkiyê ya ji Komara Kurdistanê"? Bi pirsên wusa, Wali dixwaze millet bitirsîne û di dû re jî bibêje "viya

Kurtçu'' ye û bi destê MÎT''ê ji herêmê dûr xe. Lê gel hemû zor-darî û çavtirsandinê ji cardin Walî efendi kortika sutuyê xwe xurand, ji 16 kesan bes bi du kesan karibû vê yekê bide gotin.

JI TOVÊ KURDA JÎ DITIRSIN

Ji destpêka meha Îlonê û virde ye ku hin kovar û rojnamên Tirkiyê qala jinek Kurd Necla Yuce û terrora ku li Dêrsimê tê meşandin dikan. Necla Yuce ji Pulumurê ye. Pulumur qeza Dêrsimê ye. Li gor îddia polis û leşkerên Tirk, peyê Necla, Mehmet Yuce "terorîstêkî cudaxwaze" û tevî hin bûyeran bûye. Ji 23 Gulanê û virde çend caran jinekê digirin, peyê wê jê dipirsin. Jinik ji her car dibêje ne hetîye malê û ez nizanîm li ku ye. Cara dawî, leşker jinekê bi zor dibin nexweşxanê. Dixwazin tixtor muayene bike, hela ka peyê wê hatiye cem ya na. Û dikan jî. Rapora tixtorên bêşeref, jinek "ne saxlem e", yanî mêrê wê hatiye ba wê. Û ev bêşereftî û rezalet, bi emrê Waliyê Dêrsimê û Mudîmûmê Pulumurê het kirin. Piştî ku bûyer eşkere bû û rojnamen li ser hev qala hedîsên Dêrsimê kirin hin parlamenterên SHP ji ji bo lêkolînekê çûn wir. Piştî vegera xwe van parlamenteran di beyanên xwe de gotin ku, "girtîgeha Tirkiyê ya herî mezin Tunceli (Dêrsim) ye". "Li Tunceliyê ji her 35 însanan re polîsek dikeve".

Li ser vê bûyerê mudîumûmê (sawciyê) Tirk, radibe dibêje: ".... li gor kirinin (îcreatên) me yê hetanî îro ev yek tiştêkî normal e".

Waliyê Dêrsimê jî bi hovîtî û bêşerefiya xwe dibê: "Bûyer (muayenekirina jinikê, ka peyê wê hatiye cem yan na) bi min ters nehat. Di çerçewa zanîna min a huqûqî de ne tişkî ters e".

Li hember van gotinên rezîl û
bêşeref, jinek nivîskar, Şîrîn Tekelî
Waalîyê Dêrsimê dawetî îstifaye
kir û nefret û dîtînen xwe bi van
gotinan anî zimên: "Lê wek ku
di vê bûyerê de ji diyar bû, dewlet
bi xwe di tecawuzkirina namûsê
de ger bi çi sebebî be jî, dema çew-
tîyekê nabîne, êdî ev tê wê manê
ku ji bo xweparastina jî dijminên
namûsê tu dewleta ku meriv xwe
bavê paş tuneze, nemaye" (Yenî
Gundem, hejmar 27, r.33).

Bê şik ev teror û hovîtiya cûntayê li hember gelê me yê Dêrsimê dide meşandin ne bê sebeb e. Em hemû dizanin ku burjuwaziya Tirk li hember gelê Dêrsimê pirr bi kerb e. Ji ber ku Serîhildana 1937-1938'an hîn ji bîr ne kirin e û tim yekcaran dikeve xewnê wan. Û ji bo ku carek din ji serîhildanek wusa nebînin, loma ji her barbariyê ji xwe re mubah dibînin. Heta bigihê zikê pîrekan ji "saxî" (!) dikin. Lê bê fêde ye, qet tu qewet û tu barbarî wê nikaribe pêrgiyê li ber serxwebûna gelê me bigre. Û ewê wan kirînen wan ji wek mohrek beşerefiyê her û her li eniya wan bimîne.

Destpêk r.8

REAKSİYON Lİ HEMBERÎ BEYANÊN
HAMDÎ SEVÎNÇ

meriv dikare bibîne: Yek jê, duj-
minatiya şexsîti, ya diji, ev xizme-
tekî MIT'ê ye H. Sevînc dike.
Dujminatiya şexsî ev e: Di celse-
kê mehkemê de Hamdî Sevînc hin
îfaden Gemîci bi qestî derbasî zebta
nekiribûn li ser viya Gemîci redda
hakim xwest. Dibe ku ev ji bo
Hemdî bibe kîn. A xizmeta
MIT'ê: H. Sevînc, di mehkemên
xwe da temamen bi MIT'ê re bû.
Ne ez tenê hemû kesên ku di wê
mehkemê de peyda bûne bi vê yekê
dizanin. Delîl gelek pirr in. Lê di
vir de em dikarin yek delîl nîşan
bidin. Dema hakim H. Sevînc teq-
dîren û teşdîden du sal ceza da
min, min temîz kir. Mehkema
temîzê qerara Hemdî ji ber vê sebe-
bê xerab kir: 'Tiştê ku mehkemê
pêşda ajûtiye sebeben sûc in, nabin
sebê teşdîdê. Ji ber vê yekê qerar
minasibê qanûnê nîne.' Disa mehk-
eme çêbû, hakim H. Sevînc li ser
hukmê xwe yê berê îsrar kir û
sebebekî nuh weha pêş da ajot:
'Hin haydariyên ku li derî mehk-
emê di derheqê sanîq de me bi dest
xistiye, ku ev delîlana eşkerekirina
wan li vir ne mumkun e'. Gelek
diyare ku ev haydariyên ku eşke-
rekirina wan ne mumkun e, rapor
û emrê MIT'ê ne.

Divê ku li ser viya bê sekinandin û H. Sevînç dawa îspatê lê bê kirinê.”

Zekî BOZARSLAN :

Heval Zekî Bozarslan jî texsîr
nekir, bi vî awayî nefreta xwe li
dijî rewşa H. Sevînç û "îdîa."
wî da xuyakirin:

”Wekî ku heval giş dizanin, piştî 12 Adarê hukmê leşkerî di tevayîya Tirkîyê û Kurdistanê de urfî îdare îlan kir. Pêra jî faaliyeta partiyên siyasî, yê sendîqa û yên komelên demokratîk dan sekinandin. Bi hezaran pêşverû û demokrat û sosyalist girtin û xistin zîndanê. Di pê vê bûyerê re bi demek kurt dadgehên (mahkeme) xwe yên leşkerî saz kirin. Di van dadgehên de hakimên leşkerî wezîfe girtin. Berekê dadgeha Diyarbekrê ya leşkerî wek tê zanîn H. Sevînc bû. H. Sevînc, di dijmina-

Destpêk r.8

hewşa DDKO'ya Diyarbekirê de ji aliyê mufrezeyên lêgerînê hatibû qefaltinê. Nusxeke tiqûtenê li çar ciyên cihê cihê çawa dihate qefaltinê? Ev rasterast tertîbekî bû. Di celseya 9.2.1972 an de min vê tertîbê bi vî awayî di mehkemê de li riyê sawcî xist, û min xwest bi vî awayî gotinên min derbasî zebtên mehkemê bin. Hamdî Sevînç gotinên min bi vî awayê derbasî zebtê nekir. Bi tenê da nivîsandinê ku "ev destûra PDK'ê li DDKO'ya Silvan nehatiye qefaltinê, ev tertîb e" (Binêr in li Devrimci Dogu Kultur Ocaklari Dava Dosyasi, Komal Yayinlari s. 450-470). Gotinên min û ev rêzik ji aliyê muhakeme û qerar dayinê de tiştên ji hev cihê bûn. Li ser vî min dîsa û dîsa îtîraz kir. Bi min re Mustafa Duşuneklî, Kemal Burak, Edîp Karahan rabûn îtîraz kirin. Hamdî Sevînç guh neda tu yekî ji me. Li ser vî awayî di celseya paş nivîro de, bi daxwaziya ku ji hakimîya mehkema min vekişe, min daxwazînameke nivîs-

tiya li di jê gelê Kurd û şoreşgerên Tirkên bi nav û deng bû. Ev dîjmuntaya xwe jî di mahkemên leşkerê da li dijî şoreşgerên Kurd û li dijî mafê netewiyê Kurd bê tirs û bi xedari dida ajotin. Mîsala vê xedariya xwe bi cezayên gelekî giran da îspatkirin. Di dawadDKO'yê da îstisna ne têda, temamê hevalê dawa DDKO'yê jî sê salan heta 16 salan û jî salekê heta 5-6 salan surgûn xwarin. Bêşik ev kirinên H. Sevînç perçekî ji perçê zulm û tade hukmata qolonyalista ya Tirkê bû. Di vê têkoşînê da bêşik H. Sevînç û heyata wî ya mehkemê ne bê alî bûn. Ewana biryarên burjuwaziyên Tirk li dijî gelê Kurd û têkoşîna wî ya şoreşgerî pêk danin. Celadên weha tu carî nikarin wan kirinên xwe bidin ji bîrkirin.

Nuha em werin ser îddîa H. Sevînç. Li gorî bîr û baweriya min îddîa wî ya di heqê M. Gemîcî da bê delîl e. Dema meriv îddîakî weha di heqê hinek kesan da dibêje, dibê ev îddîa bingehê wê jî hebe. Hele hele ev îddîa bê îspat, jî alî hakîmekî lêşkerî ku bi temamê kirînên xwe dujmuntayiya gelê Kurd û mafê wî yê netewî kiriyê meriv nikare bê delîl baweriya xwe pê bîne. Ev hewalê ku di derheqê wî da ev tişt tê gotin, ez wî bi şexs nasdikim û di nava vê demê da jî tu kirînekî wî yê ku meriv bikaribe jî şikê bigre ez bi xwe lê rast nehatime. Qasî dizanim, ev heval piştî 12 Adarê di xebatê siyasî da cî girtiye û dostaniya hêzekî siyasî a Kurdistanê kiriyê. Di kovara wan a kulturî da xebat kiriyê û di redaksiyona wê kovarê da jî cî girtiye. Ev heval bi hindikayî di heqê xebata siyasî ya vê tevgerê da gelek tişt dizanî bû û dikaribû gelek zirarê bighanda xebata van hevalan. Û van hevalan jî dibên ku divê xebatê da me tu zirara M. Gemîcî neditiye. Îcar îddîa H. Sevînç xwe dispêre çî, meriv viya nizane. Wek min li jorê jî anî ziman ev îddîa bê îspat e, ez bi xwe jê bawer nakim.

Hemdi Sevînç bi vê îddîayê gelo dixwaze çî bike? Meriv tê nagîhîje”.

M. GEMÎCÎ BERSÎVA H. SEVÎNÇ DA

kî da û reda wî ji mehkemê kir.

Hamdî Sevîñ bi heyeta mehkemê re gelek car, ji aliye gelek hevalan ve hatibû redkirinê, lê bi şexsê xwe yê tiqûtenê cara pêşîn û bi gumana min ya dawîn ji ber vî sedemê gotî, ji aliye min ve hate redkirin. Ji bo xirûra burokratekî eskerî yê nefsmezin, ev red kirin derbekî mezin e, û zû bi zû jî nayê ji bîr kirin. Cezayê bo min daxwazkirî ji 6 meha destpêdikir: Hamdî Sevîñ ”takdîren ve teşdîden” 2 sal ceza da min, îro jî bi vî îftirayê cara diduya heyfa xwe bi awakî layiqê xwe ji min distîne.

Bêguman gelek kes Mehmet

Destpêk r.1

**Li Farqînê 100
zarok mirin!**

Li welat gelşa tenduristi (sihetî) ne nû ye. Ji ber bêmkanî û kêmaniya nexweşxane, hekîma, heroj bi sedan insanên me dimrin. Nemaze, havînan ji ber tesîra germiyê û tunebûn û kêmaniya kanalizasyonê, nexweşî hîn berfirêh dibin û hejmara mirinê zêde dibe.

Li Kurdistanê, nexweşiya herî xeter îshal e. Bi piranî jî di nav zarokan de. Di van 3 mehên dawî de li bajarê Farqînê (Silvan) 100 zarok ji nexweşiya îshalê mirin.

Li gor agahdariyên qeymeqamê Farqînê, di nav 3 mehên dawî de 1752 kes murecatî nexweşxana Farqînê kirin e. Vana li 1462 kesan teşxîsa îshalê hatiye kirin. Ji vê hejmarê bes 275 kesî îmkana dîtine ku li nexweşxanê bînin dermenkirin. Di vê demê de, 100 zarok ji ber vê nexweşiyê mirine. Ji 100 zarokan 10 kes li nexweşxanê, 90 kes ji li melên xwe mirine. Ev reqam ji nîşan dide ku mirina van kesan bes ne ji nexweşiyê tê. Her wuha ev mirinên han, cinayetên kolonyalîstan e. Lewra 90 zarok ji bêmî-

SALVEGERA 6 SALIYA DERBA FAŞÎST
A TIRK:BEYANA HÊZÊN KURD

Heft partî û hêzên Kurd li ser
salvegera 6 saliya derba faşîst û êrî-
şa Ordiya Tirk a ser Kurdistanê
Iraqê bi hev re belavokek belav
kirin. Di belavokê de piştî meh-
kumkirina cûntayê û rûreşkirina
êrîşkirina ser Kurdistanê Iraqê
wisa tê gotin:

”Em, Partiya Gel a Kurdistanê, KUK-SE, Şoreşgerên Kurdistanê, Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistanê, Tevgera Sosyalist a Kurdistanê, YEKBÛN û Yekitiya Sosyalist a Kurdistanê bawer dikin ku hevkariya karkerên Kurd û Tirk li dijî dijminê muştêrek karek mecbûriye. Hetanî ku kolonyalizma burjuwaziye Tirk ji Kurdistanê neyê avêtin û mafê gelê Kurd yê qedera xwe bi destê xwe tayîn kirinê neyê bi cî anîn demokrasiyek bê nabên û bi îstikrar nikare bê bicîhkirin.

Welatê me û netewê me li hem ber tahlûkên gelek mezin e. Lê bûn guman ne diktatoriya faşîst û kolonyalist muqtedîrî her tiştî yê û ne jî serdestiya wan li welatê me qederek e. Emê dijminê kolonyalist biwê nevê jî welatê xwe biqewrînin, ji bona xweşî û ronahiyê gelê xwe emê serxwebûna welatê xwe bîdestîxin. Lê belê di vê riyê de hevkarî û piştgirîya hemû hêzên welatparêz sert e. Qet tu Kurdek

Gemîcî nasnakîn. Ku bernavk
 û îmzayên xwe bêjim wê bêtir
 kes binasin, lê bi vê cewetê
 naxwazim van tiştan tevîhev
 bikim. Ew qas bêjim ku Meh-
 met Gemîcî ji ber nivîskariya
 xwe ya kurmancî endamê
 Yekîtiya Nivîskarên Swêd,
 endamê koma nivîskarên kur-
 manc ê Enstîtuya Kurdî ya
 Parisê, yek ji nivîskarên Rênasî
 bultena agahdariyê ya Proja
 Kurdî ya Tensta-Rînkeby
 (Stockholm) ye. Heta niha du
 kitêbên min bi kurmancî der-
 ketine. Nizanim gelo ev xe-
 baten wiha jî karin bibin, sebebê
 îftîrakirina Hamdî Sevîncî an
 na?

kanî û kêmaniya tesîsên tenduris-
tî, mirine.

Îshal ne tenê li Farqînê talûke
ye. Li Erzurûmê 314, li Elezîzê 600
zarok bi nexweşiya îshalê ketin. Li
Entabê di vî 9 mehê dawî de 100
zarok ji îshalê mirin.

Îro li Kurdistanê ji 5/2'yê zarokan yê di nabêna 0-5 salî de bi vî nexweşiyê ne. Ev reqemên jêrîn sedemê vî yekê baş radixin ber çavan.

Di nav mirina gelemperî de para zarokan li Anqerê %6.4, li Edenê %8, lê li Diyarbekirê %49.6, li Ruhayê %42.5 e. Li gor Tirkîyê li Kurdistanê 6 qat zêde zarok dimirin. Di nav nexweşîyan de (evên ku dibin sebebê mirinê) para îshalê li Anqerê %0.8, li Edenê %2, lê li Diyarbekirê %14.5, li Ruhayê %11.1 e. Mirinê ji îshalê çêdibin li Kurdistanê 10 qat zêdeyî Tirkîyê ne.

Ev reqeman ji îsbat dikin ku, sedemê vê qetlîamê, kolonyalîstên Tirk in. Navê vê yekê ji terorîstiya tenduristî ye.

ku ji welat û gelê xwe hez dike
 nikare vê vatiniyê sist bigre ya jî
 bavêje paş. Rewşa welatê me ya
 objektîf û subjektîf vê yekê bi lez-
 tir dike. Em, Partiya Gel a Kur-
 distanê, KUK-SE, Şoreşgerên
 Kurdistanê, Partiya Pêşeng a Kar-
 kerî Kurdistanê, TSK, YEKBÛN
 û YSK ji bo serxwebûna welatê
 xwe û pêşerojên xweş û ronak û
 ji bo pêkanîna hevkarîya hemû
 hêzên welatparêz em hazirin ku
 her fedekariyê bikin. Ji ber ku ji
 xizmeta rizgarkirina welat mestir
 tu vatînî tune ye. Em ji hamû par-
 tî, rêxistinên din û her welatparê-
 zî jî daxwaz dikin ku ew jî vê bi
 cî binin”.

Destpêk r. 2

Namen Xwendevanan

jenkên neyînî, cahdeke domdar
pêwîste. Lewra dahibe bi Kurdî
pîrr û pîrr bê nivîsandin ku, rast-
nivîsandin û şaşnivîsandin ji hev
veqetin û zimanê Kurdî li ser bin-
gehê babetê xwe rûnê ku, Kurdî
bi axaftina rojane re bi nivîsandi-
na raman û pêjnan jî têrker û tekûz
be.

Bi hêviya van biwarên ku em
hevî dikin, xûrû bi Kurdî weşîna
rojname Armanc, em, pîroz dikin.
Bi silavên germîn.
ENSTÎTUYA KURDÎ
Şaxê Almanî-Beşê Çande

Destpêk r. 1

GEL JI HUKUMETA OZAL RE GOT "NA!"

Roja 28'ê Îlonê, li 8 bajarên Tirkiyê û 2 bajarên Kurdistanê hilbijartin ji bo kursiyên vala yê parlamentoya Tirkiyê (11 kursî) çebûn.

Di encama hilbijartinê de hat xuyakirin ku partiya Serokwezîr Turgut Ozal ANAP'ê %32'yê, partiya Demirel DYP'ê ji %23.5'ê, partiya Erdal İnönü SHP'ê ji %22.6'ê dangan girt. Partiya Ecewîr DSP'a ku li hember SHP bi navê sosyaldemokratiyê ket hilbijartinan jî, ji %7.9'ê dangan girt. Li gor van miqyasên ANAP'ê 6, DYP'ê 4 û SHP'ê jî 1 parlamenter qezenc kirin.

Sistema hilbijartinê Tirkiyê bi awakî wuha hatiye sazîkirin ku ferqa nabêna dangan gelek hindik be jî partiyek dikare ji ya din pirtir parlamenter derxe. Herwekî ferqa nabêna DYP'ê û SHP'ê jî %0'9 e, DYP'ê 4 û SHP'ê parlamenter derxistin.

Partiya Turgut Ozal, tevî ku di hilbijartinan de piştî xwe da zilm û zora diktatoriyê, Amerîka û monopolên giregir ên Tirkiyê û tevî ku radyo û televîzyonê bi tevayî ji bo propoganda partiya xwe bikar anî, bi milyaran pere rijand, dîsa jî li gor hilbijartinê sala 1983'ya jî %12'a zêdetir deng wenda kir.

Encama hilbijartinan didin xuyakirin, ku li temamê Tirkiyê

û Kurdistanê Tirkiyê hilbijartin hebûna, partiya Turgut Ozal karibû ji ser hukûm biketa.

Zêdetirîn a ku dengên xwe pirtir kir Partiya Demirel, DYP bû. Her wekî tê zanîn li gor Kanûna Esasî ya Tirkiyê divê Demirel û Ecewîr nekevin nav siyasê. Siyaset jî wan re hatiye qedexekirin. Lê di dema propogandê hilbijartinan herduyan jî alîkariya partiyên xwe kirin, daketin meydanan nutq avêtin, li dijî generalan û partiya ser hukûm axaftin.

Ecewîr di dema propogandê de jî partiya ser hukûm pirtir avêt partiya SHP'ê ya Erdal İnönü. DSP bi beşdarbûna nav hilbijartinan, him reyên SHP perçêkir û him jî bi xwe di binya bendê de (li gor hilbijartinê Tirkiyê, partiyek jî bo karibê tekeve parlamentoyê divê bi tevayî jî %10'a zêdetir rey bigre) ma. Ku hilbijartinê gelemperî bûna partiya Ecewîr tu parlamenter dernedixistin.

Ev hilbijartin jî di rewşek ne demokratîk de çebûn. Tu partiyên çep ên sosyalist û komunist ên Kurd û Tirk beşdarî van hilbijartinan nebûn. Herwekî tê zanîn, partiyên çepê sosyalist û komunistên Tirk û hemû partiyên Kurd qedexekirîne, mafê wan tune ku eşkere karibin an tekevin hilbijartinan.

Destpêk r.1

DÎKTATORIYA EVREN Û OZAL HAT PROTESTO KIRIN

ser rewşa gelê Kurd wisa got: "Li Tirkiyê Kurd grûbek netewî ya wisa ne ku parvekar tîne qebûlîrin. Destûr nayê dayîn ku ew bi zimanê xwe bipeyivin. Bi Kurdî çapkîrîna rojname û pirtûkan qedexa ye. Qet musadekirin ku Kurd kultura xwe pêde bibin. Ew kesê bi Kurdî biaxîfe, dikare bes ji ber vî yekê bibe mehkemekirin. Piştî derba leşkerî kurdan bêtir eziyêtiyê kişand. Kurdên li bajarê Rojhilat dijîn, divê bi hawakî îdara xwe bigrin destên xwe û ya jî bibin xwedî otonomî, ji bo ku ew dijayetî û berberî bibe helkîrin. Lê belê rejim jî dêlî viya bi gullan û bombeyan li hember kurdan şer dike. Lê wê kes şaş nebe dema Kurd jî xwe biparêzin û di ber xwe bidin".

DANÎMARKA

Hêzên aligirên Yekîtiya Çep û Komîta piştigirîya Riya Şoreş a Danîmarka di 13'ê Îlonê de li Kopenhagê jî bo protestokirina cûnta faşîst bi hev re meşek pêk anîn. Protesto li ber Buroya Turizmê a Tirkan hat kirin. Li vî derê kar û êrişên cûntayê hat rûreşkirin.

Destpêk r. 1

KURDISTANA IRAQÊ

ketin destê pêşmerge.

Di vî şerî de nêzî 40 pêşmergeyî şehîd ketin û bi dehan jî birîndar bûn. Her wiha bêtirî 100 kesên sîvil birîndar bûn. Di nav şehîdên nemir de ev nav hebûn: Şêx Celal, Şêx Îbrahîm (alîkarê berpirsiyarê koma -firqa- 51 Germiyan) û Mam Îbrahîm (alîkarê berpirsiyarê koma 21 Kerkuk).

Partiya Komunîst û Yekîti bi hev re

Mufrezek ji hêzên Yekîtiya Niştimanî Kurdistan û Partiya Komu-

nîst a Iraq roja 13.9.1986 sibehî seet 8'a de li ser riya Qadîr Kerm û Toz Xurmato kemîn danîn û gelek xusaretek mezin dan hêzên dijmin yê Seddam. Ji hêzên dijmin 11 kes hatin kuştin û yek hat dil girtin. Di nav wan de albayek, teymenek û çawuşek jî hebû.

Divî şerî de 5 hep tirinbêl hatin şewitandin, 40 perçe çek (şîleh), tîlsîzek û piqabek Toyoto bi dest xistin. Di vî şerî de mesûlek jî Partiya Komunîst a Iraqê şehîd bû, navê wî Halid Mehemed Emîn e.

Î. BEŞÎKÇÎ Kî ye?

Îsmail Beşikçi alimekî Tirk e, sala 1939-an, li bajarê Çorumê, li qeza Îskilîpê hat dinê. Dibistana ewilîn û ya navîn li Îzîkîlîpê, lîsê jî li Çorumê xelas kir. Sala 1962-ya li Ankarê dîploma Fakulta Zanyariyên Siyasî wergirt. Wê salê li Çorumê dest bi memûriyê kir. Piştî sê mehan çû eskeriyê, piraniya eskeriya xwe li Kurdistanê li bajarê Bedlîs û Hekkariyê derbas kir.

Piştî eskeriyê li Unîversîta Atatürk a Erzîrûmê bû asîstana û di wwarê sosyolojiyê de doktora wergirt. Piştî doktora xwe bi navê "Dogu Anadolu'nun Duzeni-Rewşsa Civakî ya Anadola Rohîlat-" kitêbek nivîsand. Li ser vî kitêbê, jî mamostatiya Unîversîta Erzîrûm hat avêtin, çû li Ankarê li Fakulta Zanyariyên Siyasî dest bi asîstaniyê kir. Lê piştî ku di 12 Adara 1971-an de cûnta eskerî, li Tirkiyê hat ser hukûm, di 22 Hezîrana 1971-ê de hat girtin. Ji ber kitêba wî û dersên wî yê dema Unîversîta Erzîrûmê, bi "sûcê" komunîstî û Kurdayetî wî tawanbar kirin. 13 sal hefs danê. Du salan di zindana Diyarbekir û salekê di ya Adenê de ma. Bi efuya sala 1974-an jî zindane hat berdan, lê êdî di unîversîtan de nema kar danê.

Îsmail Beşikçi piştî jî zindane derket, hê giraniya xwe da ser lêkolînên zanistî yê ser mesela Kurdan. Bi navên "Îsmail Beşikçi Davasi- Dawa Îsmail Beşikçi-", "Bilim Yontemi- Metoda Ilm-", "Kurtlerin Mecburi Iskanî- Bi Zor Bicîkirina Kurdan-", "Turk Tarih Tezi ve Kurt Sorunu- Nazariya Dîrokî ya Tirk û Pîrsa Kurdî-", "Cumhuriyet Halk Firkasinin Tuzugu ve Kurt Sorunu- Destûra Partiya Gelî ya Cumhûrî 1927 û Pîrsa Kurdî" kitêbên xwe çapkir. Li ser van kitêban careke din mehkeme di derheqê wî de vekirin. Ji kitêba Nazariya Dîrokî ya Tirk û Pîrsa Kurdî, hat hukûm kirin, sê salan di zindane de ma. Sala 1981-ê, di 12-yê meha Nîsanê de hat berdan.

Hê gava di zindane de bû, namek şandibû ji Sereka Sendîka Nivîskaran ya Îsvîçrê; Mousse Boulanger re. Di derheqê vî namê de jî, bi îdîa ku "name li derveyî welat şeref û îtîbara dewleta Tirk xera dike" dawê vekirin û di 30-ê Tîrmeha sala 1981-ê de 10 sal hukûmê zindane xwar. Ji nuh ve wî girtin xistin zindane. Îsmail Beşikçi hê jî zindankirî ye. Niha jî di zindana Entabê de ye. Îsmail Beşikçi, di mudafea xwe de, ya ji bo îtiraza biryara mehkemê, wiha got: "Di vî dawê de raman(fikir) û ilim hatiye mehkeme kirin. Gûman li serê vî dawê raman û ilim e, ne ez im."

Beşikçi wiha domand: "Tu ferqiya vî mehkemê ji mehkema engîzîsyonê ya sedsala 17-an ku Galîle mehkeme dikir, nîne. Her ew cewher serdestiyê li ser dike. Xeniqandina ramanê, benedekirin û corkirina me jî; rêgirtina li ber îfadekirina rastiyên berbiçav û serdestkirina îdeolîjiya resmî; avakirina civakek wisa ku di bin emr û îtaetê de hatiye zeftkirin, tede herkes peyva hev carî

Destpêk r.5

MIRINA XALID BEGÊ CIBRÎ

in.

Bajarê kevn, ji bal Ermenîyan ve bi nêta havigehî hatiye avakirin. Lewra hewakî gelek xweş û nedîtî bû, yê li wan herêman. Gir ji papelûk bi papelûk rez bûn. Benda dora reza girtibûn. Şerabvanî jî hebû. Ji fermana Ermenîya bi vir de rez nînin. Ji bo ku bend hatine hilweşandin li ser van girên bajarê lê belvûyî, her carê erd ji cih dileqe, çend kes dimirin.

Li jor, li gundên çiya jî, li deştê jî li taxa jor a bajarê jî kaviênê dera yênjî Ermenîyan mayî, hene. Avayêyên biçûk, yê ku bi awê Ermenîyan hatine çêkirin. Xelk ji wan re dibêjin "dêrên fila".

Yekî Ermenî bajarê Mûşê avakirîye: Mûşel Mamikonyan. Navê wê jî vir tê. Lê efsanê din jî hene: Li kela Mûşê mişkên qasî bejna merivan hebûne, di zimanê van deran de mişk "muş" e. Ji kelê derketina Ordîya Darius a ku di deştê re buhuriye şikandine. Navê bajarê jî vî peyva "muş" e tê.

Ev deşt a han gelyek e ku ber bi Anadolê ve vedibe. Lewra li vir deşt ber bi hê rojavatir gelekî teng dibe. Wadiya Mûradê wadiyek gelek dirêj û tengokî ye. Trê bi xwe bi zorê di vî wadiyê re derbas dibe.

Li jêr xaniyên ax, banê wan giha liser şîn bûne. Deşt a ku ji wan deran jî ber bi jêr dibe, li deştê gelek robarên ku dolan çêdikin...

Zivistanan jî hemû bajarê rojhilat di bin berfê de dimînin, ji spîtiyê pêştir tu tişt xuya nake.

Şêxên ku dadikevin qehwan, meriv nikare wan ji kesên din ferq bike. Ger hûn pir bala xwe bidinê, hûnê bibînin ku yê din li dora şêx hê bi îhtîram rûniştine.

Li serê çiyayên ku bajarê pala xwe dayiyê Kela Mûşê heyê. Ev kel gelekî kevin e. Dewra avakirina wê nayê nasîn. Kela Xarpêtê, li wadiyê li hember kelek e ku keşekî Ermenîya avakirîye. Kela Sînbad li serê giran, gelekî bi wêde ye. Sînbadê deryavan bi keştiya xwe hat wê derê. Ger hûn li dora Kela Niska (Mercimek Kale) ya nêzî deştê binêrin hûnê xelexan bibînin ku gava deşt hê derya bû, keştî lê dihatin girêdan.

Ji van çiyayê ger hûn berê xwe bijêr de kin û tim û tim herin, dawiyê hûnê bighên Mûtkiyê. Mûtkî ciyekî bêhempe ye ku tu qanûn lê derbas nabe.

Xalid Begê Cibrî, li van herêman hemûyan geriya. Ji van deran bû. Kurd bû. Di ordiyê de rutba wî yarbay (di nav xelkê de tê gotin ku general) bû. Ji ber ku tîkiliya wî bi serhildanê wê demê yê Kurdî re hebû, li sîka Bedlîsê hate dardekirin.

Bedlîs bajarekî kevin e. Ji van deran jî gelek ne dîr e. Ez baş çiroka Xalid Begê Cibrî nizanîm. Ger bi serhildanê Kurdî ve tîkiliyên



Beşikçi dikin, yek-dengî û bê şexsiyet e... Min gotibû, ku raman û ilim hatiye mehkeme kirin û mehkûm kirin. Lê li aliyê din, rastiyên ramanweriya ilmî û ilim divê bîne parastin. Ji rastiya ilim nayê revandin. Ji eşkerekirina ramanê ilmî û agadariyên ilmî tawîz nayê dayîn..."

Îsmail Beşikçi, li ser madda 140-î ya Qanûna Cezayî ya Tirk hatiye hukûmkirin. Ev qanûn jî li dijî wan kesan tîne bikaranîn, ên ku li derveyî welat di riya propagandê de îtîbar û şerefa dewleta Tirk pîs dikin. Li Tirkiyê jî Îsmail Beşikçi pê ve tu kesekî din jî ber hukûmê vî madde di hepsê de nîne. Bes Îsmail Beşikçi tik û tenê ye.

EFRANDINÊN ÎSMAİL BEŞÎKÇÎ

Nêzî temamiya efrandinên Dr. Îsmail Beşikçi li ser mesela Kurdî ne. Efrandinên wî yê berî sala 1971-ê ev in:

*Goçebe Alikan Aşireti, Doguda Değişim ve Yapısal Sorunlar (Eşîra Elikan a Koçer, Guherandinên Rojhilat û Pîrsa Avabûna Civakî)

*Goçebe Kurt Aşiretlerinde Toplumsal Değişme (Di Eşîrên Koçer ên Kurd de Guherandinên Civakî)

*Dogu Mitingleri Analizi (Lêkolîna Mîting-numayîşên Rojhilat)

*Dogu Anadolunun Duzeni, Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temeller (Rewşa Civakî ya Rojhilat, Bingehên Sosyo-Ekonomîkî û Etnîkî)

*İsmail Beşikçi Davasi-1 (Dawa Îsmail Beşikçi-1)

*Bilim Yontemi (Metoda Ilm)

*Kurtlerin Mecburi Iskanî (Bi Zor Bicîkirina Kurdan)

*Turk Tarih Tezi ve Kurt Sorunu (Nazariya Dîrokî ya Tirk û Pîrsa Kurdî)

*Cumhuriyet Halk Firkasinin Tuzugu 1927 ve Kurt Sorunu (Destûra Partiya Gelî ya Cumhûrî 1927 û Pîrsa Kurdî)

EFRANDINÊN WÎ YÊN NEÇAPBÛYÎ

*Tunceli Kanunu(1935) ve Dersim Jenosidi (Kanûna Tunceli (1935) û Jenosîda Dêrsim)

*Ozalp Olayı ve 33 Kurşun Olayı (Qetlîama Ozalpê û Mesela 33 Gullan)

*Kurdistan Uzerinde Emperyalist Paylaşım 1915-1923 (Parvekirina Emperyalîst li Ser Kurdistanê 1915-1923)

Destpêk r.4

CEMAL HEYDERÎ

zehlmetkêşan. Baweriyek wî ya xurt hebû bi rojên pêş ên Kurdistanê. Di helbestek xwe de dibê:

".....
Ba berz
bişeketewa
Be ser lûtekanit (*)
Du alayî sîr
Wek xwênî şehîdan
Nişaney azadî
Hayastan û Kurdistan
....."

(Bira bilind/ hêlbe/ bi ser mitikên te de/ Du alên sor/ wek xwîna şehîdan/ nişana azadiyê/ Hayastan û Kurdistan)

Cemal Heyderî, her wiha bi baweriyek xurt bi doza komunîzmê ve jî girêdayî bû. Di helbestek xwe de dibê:

Ger derbeder bim
Bê şwên û ser bim
Tûş hezar metirsî w xeter bim
Bakim pê niye.
Rêgam girtiye
Min komunîst im
.....

(Ger derbeder bim/ Bê şûn ser bim/ Rastî hezar tirs û xeter bim/ Tîrsa min nîne/ Min riya xwe girtiye/ Ez komunîst im/)

(*) Qesta wî mitikên çiyayê Agirî ye.

UZIR
Di hejmara berê de, di makala bi navê "Nameyek ji bo yara min" de hin çewtî çêbûne. Rastî divê wiha bin:
a) Sîtûn yek, paragraf du-do, rêza çaran:
Di şûna "esman" de divê "ezmanî" (ziman) be.
b) Rastiya paragrafa dawî ya makalê wiha ye:
"Lê bilanê ji evan bav û ji evan dayikan, de her zêtin kuîlkên kes û sor û zer roja hêviyan û umîdan wê di dirîne şevê û tariyan û dihilîne ser."

HEVPEYIVÎN

Reaksiyon Li Hemberî Beyanên Hamdî Savînc H.SEVÎNÇ DIXWAZE XWE JI KARÊN XWE YÊN QIRÊJ BIŞO

Bi taybetî van her du salên dawî, li Tirkîyê munaqesên li ser hukmê diktatoriya ya eskerî, di nav siyasethkar, kevne-zabit (kevne efser) û entelektuelê Tirkan de lêkolîn, munaqeşe û îfşaatên nuh bi xwe re anîn meydana.

Lê ji ber ku qanûn û hukmê serdest ê diktatoriye rê nedida munaqesên ser derb 12 ê Îlona 1980 û diktatoriya faşîst a nuha ya ser hukum, munaqeşe, lêkolîn û xatiratan (xatiraten generalan) berê xwe dan derba 12 ê Adarê 1971'ê. Hin nivîskar û generalan bi riya lêkolîn û xatiraten xwe kar û barê qirêj ê nav ordiyê, nav generalan bûyerên zordar ên mehkemen vê demê dan xuyakirin. Di van munaqesên de hin kevne general û kevnezabit ji rabûn xwestin rûreşîya xwe weşêrin, hinan ji ji bo derewên hinan derxin meydana tiştên nuh îfşa kirin. Di alîkî de ev munaqeşe vegeriya, bû munaqeşa tol hildanê, han hesab ji hev pirsînê.

Ên ku bi gesta hin hesab û tol hildanan (heyf hilaninan) rabûn yek jê ji hakimê Mehkema Eskerî ya Diyarbekir a wê demê Hamdî Sevînc bû. Hamdî Sevînc, bi zordestî fêlbazî û dijminatîya xwe ya bi Kurda, bi welatparêz û şoreşgerên Kurda re, ji bal miletê Kurd, bi taybetî ji ji bal welatparêzên Kurd ve baş tê naskirin. Lê piştî darba 1980'yî ku Hamdî Sevînc hat teqaut kirin, tîja rola demokratî û sosyal demokratîyê list.

İBRAHİM GUÇLU

"Xwedê meriv ji bela demokratên wuha bistirîne

Albay H. Sevînc ê ku di dema Derba 12'ê Adarê de, li Diyarbekir, li ser navê otorîta merkezî ya kolonyalist wezîfa mehkemekirina şoreşgerên welatparêz ên Kurd dabû ser milê xwe, di beyanên xwe yên di Rojnama Guneş (1'ê Hezîrana 1986) de ku derheq Dawa DDKO de dide, ji bo welatparêzekî hêja yê wek Mehmet Gemîcî bi bêbawerî dibêje ku di dewra mehkeman de ajaniya wî sabit bûbû. Dixwaze vê îdîa xwe bispêre dokumentên mehkemen wê demê.

Ez jî, di Dawa DDKO'yê de, wek kesekî ji wan damezrêner û karbidestên DDKO'ya Anqerê hatim mehkemekirin û min ceza xwar. Ez wek kesekî girtî di hemû qonaxên (di sefha tehqîqatê ya mehkemê û ya hukumdayînê de) Dawa DDKO'yê de beşdarbûm. Di dema mehkemekirina DDKO'yê de, ez di nav bûyer û serpehatiyên mehkemê û hevşê de bûm, min gelek tişt dîtî û ez li hember wan rawestiyam.

Di berdewambûna Dawa DDKO'yê -çimehkemen ferdî û çî jî yê tevayî- de, bi saya guhdarîkirin û bersîvdana dokumentên di mehkemê de dihatin xwendin û bi saya belgên dosyê ku hemuyan abûkatên meyên fedekar û mîrxas (ji ber ku me diparastin hinên wan bi mehan di bin çav de girtî man) ji me re dianîn û me firseta tehqîqkirina wan didît, ez dikarim bêjim ku ez yek ji wan kesan im ku bûyeran ji nêz ve nasdikirin.

Gava ezhemû sefhên mehkemê, hemû dosye û dokumentên ifade û mewqîfê bevayiyê girtiyan, beyanên ku derbasî zebtên mehkema bûn, biryarên nabênê û dawiyê wek şîrîta filmekê di ber çavê xwe re derbasdikim û tehqîq dikim, îlan dikim ku beyana Hemdî Sevîncê dijminê Kurda yê sovenê nijadperest derew û îtham in.

H. Sevînc piştî 12'ê Adarê, dest û piyên xwe ji demokratîyê re hilkir, xwest xwe di nav refên "çep" de nîşan bide. Lê di nivîsandinên xwe yên ku ji rojnamên burjuwa re dinivîsand, bi êşkeryî dida xuyakirin ku azadî divê neyê dayin Kurdan û ramanên (fîkrên) demokratên-şoreşger. Loma jî dida xuyakirin ku divê ji bo Kurdan, azadî û heqê fîkrên demokrat û şoreşgerên welatperwerî neyên dayin. Loma jî dida xuyakirin ku demokratêkî çawa ye. "Xwedê" meriv ji bela demokratên weha bistirîne.

Di dema mehkeman de, heval M. Gemîcî, hevalekî wuha bû ku, bi leca xwe ya li hemberî berjewendiyên (menfeetên) kolonyalist, bi parastina mafên gelê Kurd ên milî û demokratîk, baweriya herkesî bi xwe anîbû. Berbiçavtîrîn mîsala ku M. Gemîcî bi mehkemê re di nav lec û pevçûnekê de bû, ewe ku, hakimîtiya Hamdî Sevînc redkir. Mesela vê redkirinê ku çawa cereyankir, gava rûpelê 450-470 yê kitêba Çapxana Komal, "DDKO Dava Dosyasi-1" bên xwendin bi hêsayî wê bê dîtîn.

Ji xwe, tiştên Hamdî Sevînc dibêje rastbûna, tê zanîn ku wê tofanên giran bihata rakirin. Çîrokên wan kesên ku ajantiya (casustiya) wan di Dawa DDKO'yê de bi rastî derketîbû meydana, di devê herkesî de bûn.

Beyana Hamdî Sevînc, di vê rewşa dijwar a tevgera demokratîk a netewî ya me tê derbas dibe, erîşek wilo ye ku di riya bikaranîna hemû îmkaniyetên burjuwaziye mêtîngehkar re hatiye. Li gor îmkanan divê li hember vê bê rawestandî.

Min nivîsarek berfirehtir a ku meselê kûrtir vedikole nivîsand û rêkir nik destên nivîskarên rojname û kovarên demokrat ên şoreşger. Hêviya min ewe ku biweşînin.

Ciyê kêfxweşiyê ye, ku we îmkane xwe li hember vê êrîşa han seferber kiriye.

Carek din li dijî Kurda

Hamdî Sevînc di rojnama Tirkî ya "Guneş" de di Gulan û Hezîrana buhûrî de, li ser rewşa mehkemen vê demê, bi taybetî ji Mehkema Eskerî ya Diyarbekir dawa DDKO'yê xeber da. Û rojnamevanê rojnamê Lutfî Oflaz (ku berî 12 ê Îlonê di rojnama Aydinlik a Dogu Perîncek de dinivîsand. Aydinlik wê demê meşhûr bû, bi kar û barê xwe yê bi MIT'ê re) jî nivîsand. Hamdî Sevînc, di van beyanên xwe de xwest bide xuyakirin ku ew bi xwe kesekî demokrat û edaletperwer bû, lê ji bo ku hukmê eskerî yê 12 Adarê, di riya ordî û MIT'ê (Istixbarata Tirk) re zordarî li wan dikir, biryarên neadil û giran ji mehkeman derdiketin. Bi van beyanan re Hamdî Sevînc, dijminatî û kîna xwe ya li hemberî miletê Kurd û bi êşkeretî jî ya li hemberî girtiyan Kurd ên Mehkema Diyarbekir dawa DDKO'yê da xuyakirin. Di vê navê re navê welatparêz û nivîskarekî Kurd ê Mehmet Gemîcî da û got ku "Mesela di dewra mehkemen wê demê de derket ku mamostê Lisa Silîva Mehmet Gemîcî MIT e" (Guneş-1 ê Hezîrana 1986'a).

"H. Sevînc derewa dike"

Li dijî beyana Hamdî Sevînc him li Tirkîyê him ji li dervayî welat reaksiyonek fireh çebû.

Yek ji hakimên eskerî û naskiriyê Hamdî Sevînc ê bi navê Ustun Gungan, di kovara hefteyî ya "Yeni Gundem"ê, (hejmara 26 a) de êşkera da xuyakirin ku erê mehkemen eskerî yê dema 12 ê Adarê û dema 12 ê Îlonê, ne mehkemen adil û huqûqî bûn, erê hukmê eskerî tesîr û zor li wan dikir da biryarên giran derkevin, lê di pilankirina van meselan de Hamdî Sevînc ne bêsûc e, ew bixwe buye beşdarên planên wuha da cezayên giran derkevin. Hakim Ustun Gungan da xuyakirin ku Hamdî Sevînc xwe ji van karan dixwaze bide şuştin, lê derewa dike.

Beyanên Hamdî Sevînc bi taybetî ji di nav Kurdên ku wê demê girtiyan dawa DDKO'yê bûn, di nav wan de reaksiyon û nefreket mezin rakir. Yek ji avukatên wê demê yê Dawa DDKO'yê Şerafetîrîn Kaya, di beyana xwe ya di Kurdistan Press (hejmara 1.) de got ku: "Hamdî Sevînc xwediyê fikra anti-Kurd a fanatik e. Kemalîstekî sadiq î tam gihîştî ye. Loma jî li hember îdîa hebûna gelê Kurd, li hember daxwazên milî û demokratîk ên gelê Kurd bê tehamul bû, reaksiyonek hişk nîşan dida. Hamdî Sevînc di nav hakim û mudeîamên mehkemen eskerî yê Diyarbekir ên wê demê de, ew kes bû ku pirtirîn guh dida emir û talimatên Fermandarê Îdara Urîfî yan jî ên Erkanî Harbiyê".

Girtiyan wê demê

Şoreşger û welatparêzên Kurd ên ku wê demê girtibûn û hatibûn cezakirin, îro li derveyî welat dimînin. Yê çetîrîn ku Hamdî Sevînc nasdikirin helbet ew bûn. Me baş zanibû ku beyanên

Hamdî Sevînc ên li ser rewşa wî ya li hember Dawa DDKO'yê û li ser Menmet Gemîcî ne rastin. Îftîra ne, hesabê xweşustînê di van beyanên de hene. Lê gelo wan şoreşgerên Kurd ên derveyê welat, li ser beyanên Hamdî Sevînc û li ser "îdîa" wî ya ku "Mehmet Gemîcî MIT bû" çî difikirin?

Me di nav wan de xwe gîhand İbrahîm Guçlu, Farûk Aras, Dr.Nacî Kutlay, Mehmet Emîn Bozarslan, Bahrî Koçkaya û Zekî Bozarslan. Ji xeynî M. Emîn Bozarslan hemûyan bersîva pirsê me û fîkrên xwe dan. İbrahîm Guçlu di derek bersîva xwe de rewşa Hamdî Sevînc wuha raxist ber çavan:

"H. Sevînc piştî 12 ê Adarê, dest û piyên xwe ji demokratîyê re hilkir, xwest xwe di seffên "çep" de nîşan bide. Lê di nivîsandinên xwe yên ku ji rojnamên burjuwa re dinivîsand, bi êşkeryî dida xuyakirin ku azadî divê neyê dayin Kurdan û ramanên (fîkrên) demokratên-şoreşger. Loma jî dida xuyakirin ku demokratêkî çawa ye "Xwedê" meriv ji bela demokratên wuha bistirîne!..

Di dema mehkeman de, heval M. Gemîcî, hevalekî wuha bû ku bi leca xwe ya li hemberî berjewendiyên (menfeetên) kolonyalist, bi parastina mafên gelê Kurd ên milî û demokratîk, baweriya herkesî bi xwe anîbû. Berbiçavtîrîn mîsala ku M. Gemîcî bi mehkemê re di nav lec û pevçûnekê de bû, ewe ku, hakimîtiya Hamdî Sevînc redkir..."

Farûk Aras jî di beyana xwe de got "H. Sevînc wê îddîa xwe da tu arguman nîşan nade. Wek faşîstekî îftîrakê davêje û dimeşe".

Dr. Nacî KUTLAY:

Dr. Nacî Kutlay ji reaksiyona xwe li hember beyanên Hamdî Sevînc wuha da xuyakirin:

"Hakim Hamdî Sevînc merivekî li dijî Kurdan e û kevneperest e. Ev yeka han ji alî hemû Kurdên ku wê demê mehkeme bûn tê zanîn. Carê berî her tiştî, H. Sevînc, di domandina mehkemê de li hemberî girtiyan mîna hakimekê hereket nedikir. Ji berê de di hiş û aqîlê xwe de qerara mahkumkirina girtiyan dabû û wisa mehkeme didomand.

İddîa M. Gemîcî ajanê MIT'ê ye, ya jî muxbîrê polis e, tiştêkî wisa min ne di mehkemê de, ne di zebtên ifadan de û ne jî di dosya delîlan de û ne jî li tu derên din ne dît û ne jî bihîst. Eger ku ev îddîa rast bû, bi kêmasî wê girtiyan wê demê û abûqatên wan bizanibîya û bibhîsta. Ku tiştêkî wisa tu carî nebûye. Ez bi xwe jî vê îddîa H. Sevînc bawer nakim û wek buhtanekê dibînim. Divê meriv li hember êrîşên wisa pisîkolojîk şîyarbe û mîlet jî ji van êrîşan haydar bike".

Bahrî KOÇKAYA :

Gava me ji Bahrî Koçkaya fikra wî pirsî wî jî bi vê beyana xwe ya han xwest derew, îftîrayên H. Sevînc bide êşkerekirin:

"Gemîcî hevalekî min î kevn e û ji zûde wî nasdikim. Û em dîr û dirêj bi hev re di hefsê de jî mane. Li gor ku min M. Gemîcî naskirîye, ez nikarim vîya rast bibînim. Ev îddîa H.Sevînc, bi du renga

M.Gemici bersiva H.Sevinc da

M. Gemîcî jî wek gelek Kurdên şoreşger û welatparêz îro li derveyî welat, di sirgûnê de diji. Gava beyana Hamdî Sevînc dît, a pêşî hat bîrê ku rabe tekzîbek bi dosye û dokumentên wê demê yê mehkemê re rêke ji rojnama "Guneş" re û bixwaze, da bira H.Sevînc vê îdîa xwe îsbat bike. Wuha kir jî. Tekzîba xwe bi hin belgên mehkemê re rêkir ji rojnamê re. Lê rojnamê, ne tekzîb weşand ne jî bersîva wî da. Piştî vê wî jî ew belge û tekzîb bi namekê re şand rojname, komele û daîrên hundur û derveyî welat.

Li hundur bes kovara Yenî Gundemê (hejmar 28) cî da qismek ji nama wî.

Armancê xwe gîhand M. Gemîcî û li ser îdîa Hamdî Sevînc pê re peyivî. Bersivê M. Gemîcî li jêr in.

Armanc : Çima îro Hamdî Sevînc vê îdîayê dike?

Bersiv : Hamdî Sevînc îdîa fîlan nake, rasterast li min derew û îftîra dike. Hamdî Sevînc "demokrat bûna xwe" bi hin derûdorên ku demokrasiyê ji derveyî mafên demokratîk î insanî yê gelê Kurd didêrin, daye qebûlkirinê. Ew di karûbarê ji SHP an DSP'yê çûyina parlamentoyê de ye. Bi vê îftîrayê jî xwe re zewada vê riyê hazir kir ku dixwaze bêje : "Demokratîno! Ez ne antîdemokrat im, minê DDKO'yê ceza nekira, lê çî bikim di nav wan de 'ajanê MIT'ê wekî Mehmet Gemîcî hebûn". Bi derb weşandinekê du kew xistin, ji vê re tê gotin: Bi vî awayî perça ser dilê xwe ya kîna çarde salan ferikand, ev yek. Ya didiya jî bi îftîra kirina li min xwe di çavê derûdorên demokratên zûjîbîrkir de, xwe ji kira xwe mazûr da nîşandinê.

Di xisûsa "ajanê MIT'ê bûyîn" an nebûyina min de, divê gotinekî gotin li heviya min nema. Ji DDKO'yê 92 an 96 kes hatin girtin û ceza kirin ku piraniya vana îro li Ewrûpayê ne, merivê xuyanî ne, lîderê partiya ne, nivîskar in. Ku "ajanê MIT'ê bûna min" derketibe, lazim e di wê meh-

kemê de derketibe ku giştî çî rasterast bi nefsa xwe, çî jî bi rêgeha avûkatên xwe jî agahdar bûn, ji hûrik heta dûrik bi bûyîn bûyer û seyra mehkemê dizanin. Barê xîreta welatparêzî qelibîye ser milê wan. Bla destê xwe deynin ser wijdanê xwe yê insanî û rastiye bêjin. Ji min û ji Hamdî Sevînc, di vê xisûsê de yek derewa dike, divê ew bêjin ku yê derewkir kî ye.

Armanc : Baş e gelo di nav 92 an 96 kesan de çima navê te da? Tu fikrek te li ser vê yekê heye?

Bersiv : Ez di wê dawê de ji endametiya DDKO'yê, TCK 141/5 dihatim mehkeme kirin. Ev DDKO (Silîvan) jî "rêxistana binerdî" bûnê dihat îtham kirinê. Sebeb jî di hate nîşan dayînê ka tê de destûra (tûzûk) PDK-T (partiya Dr. Şivan) hatiye qefaltinê. Di temamê dosyayên mehkemê de jî vê destûrê nusxeke tiqûtenê hebû, lêbelê di xisûsa derdestkirina wê de du mezbetên cihê cihê û du nivîsarên polis ên cihê cihê hebûn. Li gora mezbetêkê ev li DDKO'ya Silîvan, li gora mezbeta dinê li hewşa mala M.B. , li gora nivîsara Emniyeta Silîvan li ber deriyê mala M.O. , li gora nivîsara Emniyeta Diyarbekirê jî ev di

Dûmahik 1.6

FARUK ARAS

"Wek faşîstekî îftîrakê davêje û dimeşe,"

Demeke berê, di rojnama Guneş da bîranînên hakimekî eskerî hatin weşandin. Ew hakim di nabeynê salên 1971-74 an da li Diyarbekirê reîsê dadigeha eskerî, Hemdî Sevînc bû. Hemdî Sevînc wan bîranînên xwe da, li ciyekî (hejmara 1 ê Hezîranê da) ser navê Mehmet Gemîcî disekine û bo wê îddîakê dike. Li gor wan îddîayan her çiqas endamê DDKO'yê be jî, Mehmet Gemîcî di wan salan de bi MÎT'ê (mixaberata Tirkîyê) ra xebitiye û muhakema DDKO'yê da li ser hin biryaran tesîra xwe nîşan daye.

Gelek Xwendevanên rojnamê û kesên din, dikarin baweriya xwe bi wan îddîana bînin, ji ber ku reîsê dadigeheke eskerî dek û dolabên nabeyna MÎT'ê îstixbarata eskerî da dikare ji gelek tiştan agahdar be. Lê belê, divê mirov ne tenê li ser vê îddîayê, wisan li ser navê xwediyê vê îddîayê jî baş bisekine. Ew kes çîye, çî nîne?

Di wan salên ku Hemdî Sevînc reîstiya dadigeha eskerî ya Diyarbekirê dikir, di wan dadigehan da, bi sedan welatparêz û şoreşgerên Kurd hatin muhakemekirin û bi cezayên mezin va hatin mehkumkirinê. Wan dadigehan da H. Sevînc ne wek hakimekî, wek dijminekî milletê Kurd hereket dikir. Bo vê yekê jî navê H. Sevînc wê demê ji bo gelê Kurd û welatparêzan navekî qirêj û tarî bû, îro jî wisan e.

H. sevînc wê îddîa xwe da tu argumanan nîşan nade. Wek faşîstekî îftîrakê davêje û dimeşe.

H. Sevînc bi van vir û îftîrayên xwe va dixwaze çî bike, gelo armanca wî çîye? Meriv hinek li ser bifikire bersîva vê pirsê ne diware. Ya yekemîn, insanekî welatparêz bête bîrumetkirinê, ya duwemîn jî, di nav insanên welatparêz da bîr û bawerî bête şikandin. Kesên welatparêz, van çamûr û rûreşîya dijmin baş nasdikin. Pêwiste em hemberê wan dek û dolabên dijmin rawestin û vir û derewên wan pûç bikin. Vir û îftîrayên yekê wek H. Sevînc nikarin insanên welatparêz biêşînin. Ji bo ku H. Sevînc duh jî xulamê milîtarîstan bû, îro jî.

Dûmahik 1.6